

WÊJEYA

KURDÎ

AMADEYÎ

1



Amadeyî Wêje

AMADEKARÊN PIRTÛKÊ

Qomisyona Ziman ya berê pirtûk amade kirîn

M. Şîrîn ÇETÎN, Mazlûm TEKÎN , Hewar GUNGEN, Sedîq BENEK,
M. Elî Spêrtî

Komisyona nûvejenkirina pirtûkê

M. Şîrîn ÇETÎN, Mazlûm TEKÎN

Mîzanpaj, rûpelsazî, sererastkirin û berhevkirina wêneyan

Bedredîn OY

Çapa Pêşî: 2000

Çapa Nû:

Komîta şopandinê: 2018-2019

Ferhat SOYDAN

Cemîl KARA

M. Şîrîn ÇETÎN


**Ev pirtûk; ji aliyê Desteya Perwerde û Fêrkirinê ve,
weke pirtûka waneyê hatiye pejirandin.**

Email: s.m.kurdi2014@gmail.com





Amadeyî Wêje



“Zimanê me bingehê netewa me pêktîne, divê em biparêzin û pêş bêxin.”

NAVEROK

BEŞA I	9
1. WÊJE ÇIYE?.....	10
2- GIRINGÎ Û ARMANCA WÊJEYÊ.....	13
3- ZIMAN Û WÊJE.....	16
<i>Mijara Wêjeyê.....</i>	18
<i>Naveroka Wêjeyê.....</i>	18
<i>Şêweyê Wêjeyê</i>	19
BEŞA II	20
DÎROKA WÊJEYA CÎHANÊ.....	20
DÎROKA WÊJEYA KURDÎ.....	24
QONAXÊN WÊJEYA KURDÎ.....	27
1.QONAXA WÊJEYA KURDÎ YA BERIYA AWESTAYÊ	30
WÊJEYA KURDÎ YA DEVOKÎ	32
1.PENDÊN PÊŞIYAN.....	34
2.EFSANE.....	36
<i>Taybetmendiye Efsanê yên giştî.....</i>	39
3.DESTANA DEVOKÎ	41
4.ÇÎROK.....	45
<i>Mî, Şêr û Gur</i>	46
<i>Pênaseya Çîrokê</i>	48
5.HELBEST	49
6. MAMIK.....	52
2.QONAXA WÊJEYA KURDÎ YA DEMA AWESTA.....	55
PÊŞENGÊ WÊJEYA NIVÎSKÎ YA DEMÊ AWESTAYÊ, ZERDEŞT.....	59
PÎR ŞALYAR.....	HATA! YER ÎŞARETÎ TANIMLANMAMIŞ.
JÎNAMEYA PÎR ŞALYAR (1006-1098).....	64
3.QONAXA WÊJEYA KURDÎ YA DEMA ÎSLAMÊ	66
JÎNAMEYA BEHLÛLÊ MAHÎ (-835).....	69
JÎNAMEYA BABA RECEBÊ LORISTANÎ	72
ZANISTÊN WÊJEYÎ.....	73
<i>a. Pexşan:.....</i>	73
<i>b. Hûnandî:.....</i>	73



Amadeyî Wêje


LÎZA XANIM.....	75
ZANISTÊN WÊJEYÎ	76
<i>Taybetmendiyên Hûnandiyê</i>	76
<i>Taybetmendiyên Çîrokên Hûnandî</i>	76
<i>Helbestek ji Evdilsamedê Babek</i>	77
<i>Jînameya Evdil Samedê Babek</i>	78
CUDAHİYÊN DI NAVBERA HÛNANDÎ Û HELBESTÊ DE	80
<i>Berhemên Hûnandî çine?</i>	80
<i>Helbesta Rihan Xanim</i>	83
<i>Jînameya Rihan Xanim</i>	83
HELBESTEK JI BABA TAHIRÊ HEMEDANÎ.....	84
BABA TAHIRÊ HEMEDANÎ.....	85
PARÇEYEK JI HELBESTÊN DAYÊ XEZNA SERKETÎ.....	87
<i>Dayê Xezana Serketî</i>	87
PÊVAJOYA DERBASBÛN Û HATINA ÎSLAMÊ	89
HELBESTA HERÎRÎ	91
ELI HERIRÎ (1009-1079)	92
<i>Cûrên pîvanan</i>	94
<i>HER KURD IM</i>	95
PARÇEYEK HELBEST JI ŞÊX HADÎ	96
ŞÊX HADÎ (1075-1161)	97
<i>Pîvana Arûz:</i>	98
DI SESALA XI Û XII DE REWŞA WÊJEYA KURDÎ.....	100
<i>Taybetiyên Giştî</i>	100
HELBESTA NÊRGÎZ XANIM	102
JÎNAMEYA NÊRGÎZ XANIM	103
<i>Taybetmendiyên Qafiyê</i>	104
<i>Mercên Qaxfiyê</i>	104

BEŞA1.

XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1.Sûdê wêjeyê ji bo civakan çiyê? Bihizirin û bêjin

2.Dema civakek bê wêje bimîne wê bi kîjan rewşan re rû be rû bibe?





Amadeyî Wêje

Wêje çiye?



Wêje, di wateya giştî de zanistekê ku ji yana mirovahiyê ji bo me dide têgihandin.

Mijara wêjeyê, bi hemû aliyên xwe ve boriya mirovahiyê ye. Her bêhna ku diçe dibe malê civakê.

Wêje, bingehe xwe ji ji yana exlaqê pak digre. Exlaq; hêza hizirîna hevpar ya civakê ye û wijdana civakê ye.

Ji raveyên raman, bûyer, hest û xiyalan bi gotin yan bi nivîskî ji bo xwendevan yan jî guhdarên xwe bihest, xurûş, zewq û bedewiyek bilind radighine re wêje tê gotin.

Wêje; Tê wateya pîşekarî, hûrkolîn û rêkupêk bûnê. Peyva wêje ya ku di zimanê Erebi de weke edeb tê binav kirin. Tê wateya bi rêkûpêkî û bipîvan bûnê.

Ji berhemên bi vê armancê hatîn derxistin re berhemên wêjeyî tên gotin.

Wekî tê zanîn, gelek dînamîk û hêz di pêşketina civaka mirovahiyê de, li gorî hêz, karî û şewaza xebata xwe, rol dilîzin. Çawa ku şer û nakokiyên di navbera hêzên cuda cuda de, rolekî diyar, di pêşxistina amêr û alavên cengê de leyîstiyê û çawa ku

pîvanên olî, rolek xwe ya mezin di afirandin û belavkirina hîmên bawerîya giyanî de lîstîye, her wiha wêjeyê jî di pêvajoya dîrokê de, roleke herî mezin di pêşxistina hest û zanyariya giyanî, civakî û kesayetiyê de leyîstîye û dileyîze. Di despêkê de wêje, bi baweriyên giyanî pêşdikeve, pêşketina hîmên olî, bûye sedema pêşketina wêjeya olî jî. Gelek caran ji aliyê gelek hêz û birên olî ve wêje hatiye bikaranîn. Ger mirov li hemû pirtûkên olî yên pîroz mêze bike û di nava rûpelên wan de çavênîyekê bike, wê têbigihe ku zimanê wan pirtûkan wêjeyî ye. Ji ber ku ev şewaza ziman, bandorek mezin li ser derûniya mirovan dike. Mirov zû û bi asanî fêrî jiberkirina wan tiştên olî yên di pirtûkê de hatine nivîsandin, dibe. Ji ber zimanekî helbestî û pexşanî nêzî giyanê mirovan e. Ev awa di demên destpêkê yê dîrokê de pêşketîbû.

Her weku birêz A. Ocalan jî dibêje: “Pêvajoya seretayî ya mirovahiyê, pêvajoya helbestê ye”. Rahîb û oldaran awaz û qewlên xwe bi wî awayî (wêje) digotin. Dema ku gelek dîrokzan, Zerdest weke helbestvan û wêjevan bi nav dikin, neşas in. Dema mirov bixwaze Avesta kevin, bi şewazek asayî bixwîne, wê nikaribe bixwîne! Ji ber ku ew pirtûk bi awazek helbestî hatiye nivîsandin. Niha daxwaza me ji van gotinan ew e ku, em bêjin wan kesan rastî û hêza wêjeyê bi kûrahî derxistine zanabûnê û zanîne çawa vê hêza mezin û bibandor, bikarbînin.

Her kesek ev yek bi awayekî derxistine holê. Hinekan bi serhildana leşkerî, Mînak Spartakus, Hanbî-beel, Cengiz-Xan û gelek kesên dîtir yên li dijî zilm û zorê, yan jî ji bo armancên xwe bi şûr û hêza leşkerî rabûne. Gelek ji wan jî bi serhildan û meşên aştîyane ev yek pêk anîne: “Gahandî”, hinekan jî, bi reva ji civakê, xwestine xwe ji wan alozî û nakokîyan rizgar bikin. Lê hinek kesan jî, ev nakokî, êş, lêgerîn, tirs, awaz, hêvî, çand û asta jiyana civaka xwe bi şewaza şerê spî (bêxwîn) kirine. Hinekan jî



Amadeyî Wêje

xwestine bi berxwedan, zanîn û mafnasiyê rê û rêbazên civakê rast bikin û wêjeya wê bidin naskirin. Mînak “Rêber Apo” Felsefa xwe bi vî awayî di nava refên civakê de belav kiriye.

Peyv

Gahandî (Gandî): Serokê Şoreşa Hindistanê

Hîm: Bingeh

Rahib: Zanayên olî di demê berê de

LÊKOLÎN

- 1.Wêjeyê bi awayek giştî şirove bikin.
- 2.Li gor we wêje tê çi wateyê? Binirxînin.

XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1. Ma ziman û wêje nebe, emê bikaribin bûyerekê berê jiyayî niha fêr bibin yan jî bûyerekî ji yê pişt xwe re ragihînin?

2- GIRÎNGÎ Û ARMANCA WÊJEYÊ



Wêje, ji aliyên xwe yên heyberî û rewanî ve pireke ku di navbera demê derbasbûyî û demê bê yê civakê de hatî sazîkirin û goftûgoyek berdewam e. Wêje, xweşîkirina hiş û bîrê mirovahiyê ye. Bi awayekî rast û berfireh hizirîna me birêkûpêk dike. Wêje, ji bo rêkûpêkirina zanabûn û sazûmankirina demê bê, jêdera herî girîng ya ku pêwîst e mirov serî lê bidêye. Em çiqasî rabirdoya xwe bizanin, emê ew qasê jî xwe, netewa xwe û cîhana xwe, baş bizanin. Kesê wêjeya civaka xwe nezane, dimîne miroveke bêhiş.



Amadeyî Wêje

Afirandina çanda gel ya hevseng bûyî, bê wêje nabe. Wêje kilîla pêşketina civakê ye. Belê ev baskên ku me anîn ziman, bêyî hev nabin û hevdu temam dikin.

Ji ber hêz, hebûn û sembola netewekê ziman û wêjeya wê ye. Ger gelê me heya niha hebûna xwe parastibe û gihan dibe îro, dewle serê zimanê hevsengkirî û wêjeyê ye.

Dema em temaşê dikin, dibînin ku îro di Cîhanê de gelek zimanên, bes di nav rûpelên dîrokê de yan li ser bere fêrşa yan jî jar û lewaz mayîn, hene. Ev rewşa dîrokê girîngiya wêjeyê dide kifşkirin. Li gelek aliyên Cîhanê, hinek ziman tenê li nav êl û eşîrekê têne axaftin. Ji ber ku ji aliyê wêjeyê ve nehatiye têrkirin. Li aliyê din, zimanê ku nikari be wêjeya xwe ya devokî, bi afirîne, nikare wêjeya xwe ya nivîskî jî bi afirîne. Zêde pêşve naçe û her wiha nikare xwe li ser piyan bigre û hebûna xwe bidomîne.

Dagirkerên welatê me, xwestine me tine bikin, ji ber wê her tim ziman û wêjeya me qedexê kirine. Ji ber ku zanîne tinekirina netewekî bes bi tinekirina ziman, çand û wêjeya wî pêkan e.

Ger em rewşa coxrafya welatê xwe, bi temamî raxin berçavan, wê hêj baştir bê dîtin ku gelê me çiqas ziman û wêjeya xwe bibiryar parastine. Ger gelê me bi heskirin û vînek mezin li ziman û wêjeya xwe xwedî derneketiba, nediyarbû ku ziman, wêje û gelê me weke gelên din yên di nava rûpelên dîroka Mezopotamyayê de, windabûyî, wê windabibûya.

Nexwe neketin û tûnebûna gelê me, ji ber li ziman û wêjeya xwe xwedî derketiye. Bi vê boneyê ronakbîr û zanayên welatparêzên Kurd, berî her tiştî bala gel kêşane ser parastina ziman û wêjeyê. Nivîskar û helbestvanên me yên weke Baba Tahîrê Hemedanî, Ehmedê Xanî û hwd. Ji bo parastina ziman û wêjeya xwe rolekî girîng û bingeîn leyîstine.

Mirov dikare bêje ku her baskê wêjeyê, hiş û bîreke saxlem û taze ye. Li gel vê jî pêhes û vînekî mezin di dilê mirovan de dide çêkirin.

Peyv:

Rewanî: Manewî

Rabirdo: Dema Borî

Bêhiş: Ne li ser hişê xwe

Kilîl: Mifte

Sembol: Nîşan

LÊKOLÎN

1. Çima hinek ziman ji dîrokê hatine rakirin?
2. Çima dagirkerên Kurdistanê dixwestin ziman û wêjeya Kurdî tine bikin?

XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1. Gelo hûn têkîliya ziman û wêjeyê dizanin?
2. Ziman bê wêje dibe?

3-Ziman û Wêje



𐎶	𐎵𐎶	𐎶	𐎶	𐎶𐎶
𐎶𐎶	𐎶𐎶	𐎶𐎶	𐎶𐎶	𐎶𐎶
𐎶𐎶	𐎶𐎶	𐎶𐎶	𐎶𐎶	𐎶𐎶
𐎶𐎶	𐎶𐎶	𐎶𐎶	𐎶𐎶	𐎶𐎶
𐎶𐎶	𐎶𐎶	𐎶𐎶	𐎶𐎶	𐎶𐎶
𐎶𐎶	𐎶𐎶	𐎶𐎶	𐎶𐎶	𐎶𐎶
𐎶𐎶	𐎶𐎶	𐎶𐎶	𐎶𐎶	𐎶𐎶
𐎶𐎶	𐎶𐎶	𐎶𐎶	𐎶𐎶	𐎶𐎶
𐎶𐎶	𐎶𐎶	𐎶𐎶	𐎶𐎶	𐎶𐎶
𐎶𐎶	𐎶𐎶	𐎶𐎶	𐎶𐎶	𐎶𐎶

Ji bo ku mirov û civak bikaribin, xwe bi awayekê herî baş rave bikin, riya herî bibandor wêje ye. Wêje çiqek yê hûnerê ye ku hemû bûyer, hest, hizir û xiyalên di nava civakê de digre nava xwe. Di encama van peywendî û bandoran de, diyar dibe ku civakan bi qonaxên borandî, xwe gihandine şêwazên wêjeyî. Di Cîhanê de gelên bê wêje nehatine dîtin û her gel bi wêjeya xwe tê naskirin. Wêje hûnerê ravekirina xweşik e û hemû bûyer, hest, raman û xiyalan di nava jiyana civak û mirovan de bi awayek nivîskî yan devokî pêktîne. Bi derketina berhemana re hizir û

raman derdikevin hole, her ku amêr tên derxistin û pêşxistin, pêwîstiya pêşxistina ziman û wêjeyê di nava civakê de çêdibe. Ev bû sedem ku pergalek hevbeş di nava mirovan de bê afirandin. Ev amêra hatî afirandin ziman e. Ji ber ku wêje, xwe dipesêre ziman, bi pêşketina ziman re wêje jî pêşdikeve.

Dî jîyan mirovan de ziman, parçeya herî zindî ye. Weke di gotinên pêşyan de jî tê gotin; “gelê bê wêje, di dilê mirovê bê ziman de ye.” Pêşketina mejî hêlaye ku mirov, li ser bûyerên di xwezayê de û di jiyana mirovan de çêdibin, bihizire. Jiyana mirovahiyê ya despêkê her çiqas ne bi zanistî jî be, lê dîsan jî bûye hîmê bingeîn, ji hizir û hûnerên li pey xwe re.

Bi pêşketina civakê re hizirê mirovan jî hêj zêdetir pêşdikeve. Aliyek yê vê pêşketina hizirê mirovan, bû wêje û berhemên wêjeyî. Wêje, hûnerek yê bi ziman hatî holê ye.

Peyv

Peywendî: Têkîlî

Hîm: Bingeh

Qonax: Pêvajoyê, Dem

ZANISTÊN WÊJYÎ

Ji şîroveyan ramanan, bi gotin yan jî bi nivîsînê dide têgihandin û hest, xurûş, zewq û xiyalên xwendevan yan jî guhdaran bilind dike re wêje tê gotin.



Amadeyî Wêje

Di vê rewşê de amêra wêjeyê ya bingehîn ziman e. Çêbûna berhemê wêjeyî bi awayê herî baş û bibandor bi dewle serê ziman pêktê.

Mijara Wêjeyê

Mijara wêjeyê; bi giştî mirov e, bi taybet civak e. Weke Rêberê Gelê Kurd A. Ocalan jî dibêje: “Hûner û wêje dû amêr in ku bêt wan civak nabe.” Wêje netenê wêne kêşana jiyanê ye, di heman demê de pêwîst e wêje, gel pêşbêxe û ji gel re xizmetê bike. Ger wêje ne ji bo pêşxistina civakê be, ne di berjewendiyê gel de ye. Yê gel nasneke, birînên wan nebîne û êşa wan nekişîne nikare wêje û dîroka wan jî binivîse.

Li gorî vê wêje, çavkaniya afirandina mirov û civakê û her wiha afirandina rêzdayîna wan e.

Naveroka Wêjeyê

Şêweyê têgihandina mijarekê, cûrên helbestan, cûrên nivîsînên wêjeyî, daxwaz û armancên wêjeyê pêktînin. Ev bi giştî bi şêwazê hûnermendekî, dewlemend dibe û di berhemên wêjeyî de tê nivîsin. Ji ber vê sedemê dema xwendevanek berhemê nivîskarekî dixwîne, rewşa pêşketina cîhana xiyalên wî, nirxên bi rûmet û dewlemendiyên wî anî ziman, hestên wî hûnermendî, bi ahengekê sazûmankirî dibîne.

Ji tevayî mijarên berhemekî re naveroka wêjeyê tê gotin.

Şêweyê Wêjeyê

Wêje, çiçek ji hûnera xweşik e. Bi gelek aliyên xwe weke zanîstekê, tê bi dest girtin. Wêje, ji şêweyê dîrok, civaknasî, derûnasî, felsefe û aboriyê sûd digre.

Di hemû berhemên wêjeyî de, armanc; gihandina peyamekê ji bo gel û hûnermendên wî gelî ye. Hûnermendên gel, Cîhana hundirîna civakê û pileya çanda wê li berçav digre û berhemê xwe pêktîne.

LÊKOLÎN

1. Naveroka wêjeyê çiye?
2. Têkîliyên di navbera ziman û wêjeyê de lêkolîn bikin.



BEŞA II


XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1. Gelo hûn dizanin dîroka wêjeya Cîhanê kevnar e?
2. Hûn dizanin çavkaniya wêjeya Cîhanê, wêjeya Kurdî ye?

DÎROKA WÊJEYA CÎHANÊ

Dîroka wêjeyê xwe dipesêre berhemê civakê afirandî. Berhemên wêjeyê weke hemû hizir û berhemên din, ji ber ku di debarê jiyana civakê de ne û çanda civakî dişopînin, hem weke berhem hem jî weke belgeyek ya demê nivîsina nivîsînê zindî dike; tê bi dest girtin. Bi afirandiyên xwe, mercê dema jiyayî û taybetmendiyên derdor digre berçav û lêkolîn dike. Di nava pêvajoyê de guhartin û pêşketinên civakê dişopîne û bi vî awayî rewaniya civakê dide diyarkirin.

Pêwîst e biwêja “Heyînên Rewanî” bi awayek fireh bigre dest. Dîroka wêjeyê her çiqas ne dîroka çandê be jî bi awayekî dîroka ol, felsefe, hoy û hûnêrê bigre nava xwe fireh e. Ev bi awayek diyar, di dîroka wêjeyê de cih digre.



Ji derveyî wê jî her berhemên dîroka ol, felsefe û hoy digrin dest jî, li gor awa û guhartinên demên xwe berhemên wêjeyî ne. Dîroka wêjeyê hem aliyê hizir, hem jî yê hûnerê têkildar dike.

Di vê roja ku cîhana çandê her ku diçe dewlemend dibe de asoya wêjeyê fireh dibe, li dîroka wêjeyê erkên giran tên barkirin. Dîrokzanên wêjeya hemdem û hozanên wê “ne ku ji ber neyên jibîrkirin yan jî ji bo vînên xwe bikin çîrok berhemên xwe dinivîsin. Tenê zanîn dayînê jî bes nabînin; dixwazin lêhûrbûn, lêkolîn, daketina wajeyan, pêşxistina mirovahiyê, dîroka wê, nivîsîna têgeha netewên cîhanê bi awayekê têgihiştî ragihînin. Dîroka wêjeyê bi qasê rêjeya ku vê serbêxe, erkê xwe pêktîne.

Dema berhemê wêjeyê tê gotin, berhemek hûnerî yê ku hestên xweşik şiyar dike, xweşa xwendevanan tîne, deng li hiş û merg dike, ratêxe berçavan.

Yek ji kêrhatinên berhemên wêjeyî ew e ku bi awayekî rast, bi armanca hilberînê neyê nivîsîn û xema hûnerê jî hilgire. Li gel



Amadeyî Wêje

vê jî biwêjên berhemên wêjeyî, divê di çarçova dîroka wêjeyê de bi wateyên hêj firehtir bê pejirandin. Weke dîwanekî, hamseyekî û koma kovaran, pirtûkek dîrokê, heya pirtûka tasavvuf û kimyayê jî dikeve nava xebatên dîrokzanên wêjeyê. Ji ber ku beşek ji van bi xema hûnerê hatine nivîsin; demê nivîsîna nivîsinê hest û ramanên xwe, wek heyî dane pêhesîn. Yên ku bi armanca hînîkirinê hatîn nivîsandin jî, li ser mijarên diyar bawerî û têgehên wê demê didin diyarkirin. Li milê din jî taybetmendiye ziman, biwêj û wajeyan jî hildigre. Bi vî awayî tevayî berhemên hizirî dikare bigre nava vê komê.

Berhemên wêjeyî, me neçar dike, nivîskarê wê nas bikin û lêkolîn bikin. Xebatên dîroka wêjeyê jî pîranî di vê navendê de ne. Nivîskarekî bes bi xwendina berhemên wî em nikarin nasbikin. Her nivîskar, mirovê dema xwe ye. Bandorek mezin ya herêma têde hatî Cîhanê û mezin bûyî, derdora li têde gihayî, kesên pêre têkîlî danî, li ser wî heye. Li aliyê din, divê em rewşa nivîskar ya bedenî, pîvanên wî yên xwendinê, pîşeyê wî, bîrdozî û jiyana wî li berçavan bigrin. Ji ber vê ye ku divê em bandora kesayeta wî derxistî holê têbigihin; bi rêzê ve berhemên wî lêkolîn bikin, wî dibin kîjan mercan de û bi kîjan hestan nivîsiye lêkolîn bikin, nas bikin û bidin naskirin.

Peyv**Hemdem:** Pêşketî**Hozan:** Nivîskarê Helbestan**Hamse:** Helbestên ji pênc awazan pêktên**Tasavvuf :** Zanista sofîti (pesin dayîna Xûdê)**Waje:** Peyvên ji bo wateyekê ketî qalibekê de**Lêhûrbûn:** Venêrînkirin, vebijartin**LÊKOLÎN**

1. Pêwîst e armanca nivîskarê wêjeyê çi be?
2. Berhemên wêjeyî me neçarî çi dikin û çima?

XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1. Gelo hûn dîroka wêjeya Kurdî dizanin?
2. Hûn dizanin kengî dest pêkir û çima?



DÎROKA WÊJEYA KURDÎ

Wêjeya Kurdî, weke hemû wêjeyên Cîhanê bi derketin û pêşketina mirovahiyê re derketiye holê. Wêjeya Kurdî ya ku li ser çanda Neolotîk hatî avakirin, xwediyê gelek dewlemendiya ye. Evê wêjeya dewlemend beriya derketina Awestayê bi hezarên salan hebûna xwe bi awayek devokî daye domandin. Pîraniya berhemên wêjeyî yên wê demê, bi awayê hûnadî bûn. Bi derketina Awestayê re ev wêje bûye çavkaniya wêjeyên Rojhilata Navîn ya nivîskî, yanî Awestaya ku bi zimanê Medî hatî nivîsandin, bûye mînak ji gelên Rojhilata Navîn re. Her çiqas wêjeya Kurdî nebûye wêjeya deshilatdariyê lê ji ber dewlemendiya xwe bandorek mezin ya erênî di Rojhilata Navîn û Cîhanê de pêkaniye. Bi taybet piştî hatina Îskenderê Makedonî û êrişa wî ya li ser nivîsînên wêjeyî yên Kurdî; wêjeya Kurdî birînên mezin girtine. Ew wêjeya ku di leza xwe ya pêşketinê de bû, piştî wê demê bes kariye hebûna xwe bi awayek devokî biparêze. Vê rewşa parastinê, heya hatina Îslamê domandiye. Piştî hatina Îslamê û Kurd bûyîn Musliman, wêjeya Îslamî ya ku bingehe wê Erebî ye; herikiye nava wêjeya Kurdî. Ji ber ku wêjeya Kurdî pir kevnar û dewlemend bû; di gelek cihan de wêjeya Ereban û netewên din jî jê bandor dibin. Heya roja me ya

Îro jî gelek peyvên wêjeya me di nava ziman û wêjeya derdor û Cîhanê de tîn dîtin.

Bi hatina Îslamê re her çi qas wêjeya me jê bandor bibe jî gelek wêjevanên me yê ku fêrî nivîsînên Erebi bûyîn gelek berhemên giranbiha bi tîpên Erebi lê bi zimanê Kurdî nivîsîne. Yanî bi vî awayî wêjeya Kurdî dikeve qonaxek nû. Ew rewş heya avakirina Komara Tirkîye berdewam dike. Her çi qas Komara Tirk gelek êrişên hovane birin li ser wêjeya Kurdî jî lê ji ber dewlemendiya wêjeya Kurdî û bibiryarbûna wêjevanên wê, nekariye li pêşiya pêşketina wê bibe asteng. Li gel hemû astengiyan hebûna xwe hem devokî hem nivîskî parastîye.



1 Amadeyî Wêje

Peyv

Neolotîk: Serdema despêkirina çandiniyê

Awesta: Pirtûka Zerdeşt

Med: Pêşiyên Kurdan

Mekedonî : Navê bajarek yê Yunanê

LÊKOLÎN

1. Wêjeya Kurdî ya nivîskî kengî bû çavkaniya wêjeya Rojhilata Navîn?
2. Çi bû sedem ku wêjeya Kurdî ya dewlemend leza pêşketina xwe rawestîne?

XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1. Li gorî we pêwîst e mirov wêjeya Kurdî di çend qonaxan de bigre dest û çima?

2. Qonaxa herî zêde wêjeya Kurdî xwerû mayî kîjan e?

QONAXÊN WÊJEYA KURDÎ

Ziman û wêjeya Kurdî, li gor dem, xaknîgarî û olan di çend qonaxan re derbas bûye. Dema em temaşeyî, dîroka ziman û wêjeya Kurdî dîkin, dibînin ku ji ber şoreşa çanda Neolotîk bi destê gelê Kurd hatiye pêkanîn, zimanê gelê Kurdî jî ji beriya zimanê civakên din derbasî rêkûpêkiyê bûye.

Lewra pêwîstiya Kurdan wê demê bi afirandina peyvên nû hebû; ji ber ku her tiştek dihat afirandin û ji bo wê navek dihat xwestin û ew jî neçarbûn jêre navekê peyda bikin.

Her wiha têkiliyên civakê jî mirov neçarî sazûmankirina hevokên ji bo danûstandina hev dîkir.


Di vê qonaxa ku em weke qonaxa beriya Awestayê pênase dîkin de, wêjeya Kurdî bi awayekî xwerû, heyîna xwe bi awayekî devokî û girêdayî xwezayê didomîne. Pîranîyên helbest û stranên wê demê, li ser xweşîkbûna xwezayê û bûyerên girêdayî xwezayê bûn yanî hema hema tevayî helbestên wan bi awayê girêdayî xwezayê (natûral) bûn.

Piştî vê qonaxê, Wêjeya Kurdî, gavek mezin tavêje û bi pirtûka pîroz Awestayê derbasî nivîsînê dibe. Her çiqas ev qonax, bi qirkirinê re rû be rû mabe jî, xwerûbûna xwe heya hatina Îslamê domandiye.

Piştî hatina Îslamê, her çiqas di aliyê nivîskî de pêşketin bi xwe re çêkiribe jî, lê di nava xwe de helandinek daye jiyankirin.

Lê piştî sedsala XVIII'an gelê Kurd dest bi qonaxek nû kir û êdî ziman û wêjeya xwe, hinek pêşde dan. Êdî wêjeya xwe ne bi tûpên Erebi belkî bi tûpên xwe yên xweser yên ku ji aliyê Celadet Bedirxan ve hatîn sazûmankirin, nivîsandin. Her çiqas êrişên herî dijwar bi taybet, ji aliyê Dewleta Tirkî ve hatibin kirin jî, lê gelê Kurd bi serhildan û berxwedanên xwe li wêjeya xwe xwedî derketin û ji bo parastin û pêşxistina wê xebatên heja domandin. Dema em temaşeyî vî rewşê dikin, têdigihin ku ziman û Wêjeya Kurdî di çar qonaxên girîng re derbas bûye û heya roja me ya îro hatiye.

Qonaxên Wêjeya Kurdî



Peyv

Qonax: Serdem

Awesta: Navê pirtûka pêroz ya Zerdeşte

Natural: Xwezayî

LÊKOLÎN

1. Çima Zimanê Kurdî zûtir derbasî wêjeyê bû?
2. Cûdabûna di navbera beriya Awsetayê û demê Awestayê de çiya?

1.QONAXA WÊJEYA KURDÎ YA BERIYA AWESTAYÊ



Ev qonaxa ku ji demê neolotîk despêdike û bi hezarên salan pêşketina wê li ser xweza û çandiniyê didome.

Di vê qonaxa xwezayî de pêvajoyên gelek girîng derbas dibin. Mîna li ser bingehe vê wêjeyê, çanda Aryen hatiye avakirin. Li ser çandê Rêber APO jî wiha dibêje: "Koma ziman, wêjeya Aryen çi di warê ziman de, çi jî di avakirina hevsengiya hest û ramanan de, xwedî kokek kûr e. Ev yek jî bi mercên coxraffî û dîrokî ve girêdayî ye. Salên navbera 12000-4000 BZ. dema bi cihbûn û bisazbûna vê çandê û vî zimanî rave dike. Di vê serdemê de her cûre kuzikvanî, ji bo ajotina zeviyan bikaranîna nîr û lawiran, tekelik, tevin, destar, hûner û hwd... saz bûye... her wiha xelkê herêmê îro jî van amûrên çandê û koma gotinên van amûran rave dikin, bikartînin, ev jî nasnameya devera kakil yan jî dendik ronî dike. Li ser çanda Hûriyan ya ku di vê qonaxê de jiyayî jî Rêber Apo wiha dibêje: "Komên 'Aryen' yên ji proto-Kurd, Fars, Afgan û Belûciyan di vê goftûgoyê de, cihek girîng digirin. Bi

taybet rengê zimanê Hûriyan ku proto-Kurd in, diyar bû, xwemalîya çand, ziman û wêjeya Aryen ya xwe dispêre gelên otanîk zelal bû. Teza ez bi xwe jî rast dibînim, ew e ku herêma kakil ya şoreşa Neolîtîkê tenê bi vê çand û zimanê çêdibe. Bi vî awayî mirov dikare bêje ku Hûriyan (Çand, ziman û wêjeya Areyanî) pêşengî ji koma ziman û çanda Hînd-Ewrûpan re kiriye û pirsgrêkên wê yên çavkaniya ku xwe dispêre koka wê çareser kiriye.

Dîsa bi hêza ji vê wêjeyê hatî girtin, Kurdan kariye Împaratoriya Gotiyan avabikin. Her wiha rêvebirina dewleta Mîtanî jî, çanda xwe bi vê wêjeyê xemilandiye. Heta ev wêjeya ku li ser çandekê kevnar hatî avakirin bûye bingeh ji bo derketina Awestayê û pêşxistina çanda Medan jî. Bi awayek giştî di vê qonaxê de, her çiqas nivîsîna li ser beran û şkeftan hebe jî, lê wêjeya Kurdî bi awayek devokî hatiye domandin.

Peyv

Arî: Tê wateya agir, ya duwem jî tê wateya erdê-xakê.

Hûrî: Pêşiyên Kurdan

Gotî: Pêşiyên Kurdan

Mîtanî: Pêşiyên Kurdan

Belûcî: Kêmenetewek kevnar yên dibindesthilatdariya li Îranê de dijn.

LÊKOLÎN

1. Çanda Aryen li ser kîjan çandê hatiye avakirin?
2. Hûn çi cudahiyê di navbera çanda Aryen û çanda Hûriyan de dibînin? Şîrove bikin.

XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1. Sûdê wêjeya devokî ji bo wêjeya nivîskî çiya?
2. Wêjeya Kurdî ya devokî ji çi pêktê?

WÊJEYA KURDÎ YA DEVOKÎ

Piştî çêbûna ziman, ziman û wêjeya Kurdî ya devokî jî despêdike. Ji ber ku gelê Kurd, di pêvajoya dîrokê de her tim bawermend bû; her tim aliyek yê wêjeya wê, di aliyê Xudanasî de xwe pêş xistiye. Weke hemû netewên din yên Aryenî di berbanga dîrokê de, baweriya Kurdan jî bi Xudê hebû û ew perestine.



Her wiha xwe bi perestgehên; Heyîv, Roj, Stêrk, Agir, Av, Ba, Birûsk û tiştên bi vî rengî mijûl kirin. Wan di despêkê de, laşê miriyên xwe binax nekirine. Wan laşê miriyê xwe birine li ser lûtkeya herî bilind ya latekê, da ku laşxwer wan bixwin. Bi vî awayî wan xwestiye ku dîsa bikeve nava laşê giyanwaran lê paşê ev rêbaz ji hole rakirine; laşê miriyên xwe pêçane û li çiyayan dibin axê de veşartine.

Piştî ji malbata Espîتمانî ya Medyayî kesekî bi nava Daxza (Zerdeşt) rabûye, gel vexwendiyê, banî gel kiriye ku Xuda yê bi tenê biparêz in; baweriyê pê bînin, gel jî pejirandiyê û olê wî pejirandine.

Her wiha di pêvajoya jiyana Kurdan de, di her qadên jiyane de jin û mêr bi hev re bûne. Ji ber wê sedemê beşek yê wêjeya me; li ser têkiliyên di navbera jin û mêr de pêşkêtiye. Dîsa ji ber bingehê xwe dipesêre çanda Neolotîk; hinek beşên wêjeyê xwe, li ser xeml û xêla welat pêşde birine. Dîsa ji ber ku piranî, jina Kurd, bi çandinî û xwedîkirina zarokan ve xerîk bûye; piranî navên şînatîyan di roja me de jî mêzan e. Her wiha gelek stranên melûlî yê dayîkan ji bo zarokên xwe gotî, hebûna xwe diparêzin. Dîsa ji ber zîlam bi karê nêçîrvaniyê ve xerîk bû; li ser lehengiya zîlam stranên Kurdî hene; tê gûman kirin ku ev stran jî ji aliyê jinê ve hatine hûnandin . Ev wêjeya ku ji berî despêkirina wêjeya nivîskî, bi hezarên salan hebûna xwe parastî; di çend beşan de, em dikarin bigrin dest.



Beşên Wêjeya Devokî

1. Pendên Pêşyan
2. Efsane
3. Destan
4. Çîrok
5. Helbest
6. Mamik

LÊKOLÎN

1. Wêjeya Kurdî ya devokî çawa pêşkêtiye? Lêkolîn bikin.
2. Roja jinê di wêjeya devokî de çiya? Lêkolîn bikin.

XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1. Kurdan tore, felsefe û baweriya xwe bi dewle serê pendên pêşiya aniye ziman yan na?
2. Kurdan pendên pêşiyên çawa bikaranî ne?

1. Pendên Pêşiyên



Çanda Gelê Kurd, di hêla pendên pêşiyên de gelek dewlemend e. Di vî warî de xwediyê wêjeyekî eşkere ye. Pendên pêşiya ji çend gotinên kurt yên Kurdî pêktên. Xwedî wateyekî hêja ne. Ev gotin ji berê ve li hember zoriyan li berxwedan û heya roja îro hatine. Di van pندان de awayê jiyan, rêz û tore, bîr û baweriyên kevin yên neteweya Kurdan di warê civakî, ramiyari û maldarî de derdikeve holê. Pêkhatina pendên pêşiyên di dema xwe de, bi vî awayî ye: kengî karesatek pêkhatiye, gotinek li ser wê karesatê hatiye gotin û ew gotin dev bi dev geriyaye û heya niha wek pendek hêja ji me re maye.

Li ser hemû aliye jiyanê, mirov dikare pendên pêşyan bibîne. Ji ber ku di zimanê me de jimarek pir zêde û nediyar pendên pêşyan hene. Lê mixabin ji ber bindestiya gelê Kurd, heya niha ev berhem nehatine komkirin.

1- Kesê dibêje nediyar in û malê civakê ne.

2- Li ser wateyê hêlên şîrîk yê civakê hene.

3- Ji taqîkirinê civakê hatine afirandin, para xwe ya xapandinê kême.

4- Zêde cih nadin hûnerê û xemilandinê, xwediyê şirovek xwerû ne.

5- Ji ber ku wateya xwe kûrin qada karanînê teng e.

Mînak:

- "Agir gûla zivistanê ye."

- "Heya mirinê kirine."

-Vêxistina agir hêsan e, lê vemirandina wî zehmet e.

-Bez ne di zekê çûkê de ye, di zikê gayî de kom dibe.

Dema em li pendên li jor temaşe dikin, dibînin ku li ser hemû qadên jiyanê hatine gotin.

2.Efsane



Efsane; bi derketina û pêşketina hizirê mirovan re derdikeve holê. Dema mirovan xwestiye girêdayî xaknîgariyê, kesayetên hêja, tişt û cihan pîroz bikin û ji bo çareserkirina vê mijara veşartî bi awayên cûr be cûr şîrove dikin. Li ser van hinek bûyerên hatîn jiyan kirin jî zêde dikin û ji nifşekî ji nifşekî din re radigihîne. Şîrove û ragihandinê hatîn pîroz kirin piranî bi awayekî devokî belav dibin. Di encama vê de çandek devokî çêdibe. Efsane endameke ku mirov bi mirov ve, mirov bi xaknîgariyê ve, mirov bi heyînên din ve, mirov bi rewaniyê ve û her yek bi yekê ve dide girêdane.

Piranî mijarên efsanê; perwerdekirina zarok, ciwan û navsera ne. Dide diyarkirin ku hoyê xirab çiqas xirab û yê baş jî çiqas baş e. Her wiha xirabiya fêlbaziyê, nankoriyê, konojiyê ratêxe berçavan. Dîsa xweşikbûna rastî, dirûstî, merdbûn û bipîvanbûnê bi awayekê pir zelal ji me re didediyarkirin.

Efsane; li ser van her sê endaman tê avakirin; awarte, rast û pîroz. Ger dû endam jî hebin dibe.

Sê kokên esfanê hene; ev jî ol, mîtoloji û dîrok e.

Weke her civakekê gelê Kurd jî girêdayî vê rêgezê efsaneyên xwe nivîsandine. Di nav netewa Kurdan de, efsane xwediyê cihekî pîroz e. Her wiha cihekî taybet di wêjeya Kurdî de digre. Heta niha jî di nava Kurdan de, dev bi dev efsaneyan dibêjin. Efsane; di nav gelê Kurd de xwedî pay e. Efsan, wêneyekî ji bo ronîkirin û fêrbûna awayê jiyana gelê Kurd e. Em bi riya efsanê, rojên borî, serpêhatî û karesatên bi ser Kurdan de hatî; awayê jiyana wan ya wê demê fêr dibin.

Gelek Efsaneyên Gelê Kurd hene.

Mînak:

Dibêjin rojekê, mezinê Ferhîdê cinan, wan kom dike û dipirse: “kê ji we du seriyê weke hev bikeve li ser balgîhekê dîtiye.” Ferhîdek rabû û got: “paşayê min, ez dû kesan nas dikim; lê mixabin gelek ji hev dûr in. Nepêkane ku her dû bigihin hev.” Paşa dipirse: “Kîne û li kûderê ne?”

-Yek Sitiya Zîna keça mirê Botan e, li Cizîra Botan dijî. Yê dî jî Memê Ala yê kurê mirê bajarê Mexribê ye û ew jî niha li bajarê Mexribê ye.

Paşa dibêje:

-Tû dikarî wan her duyan îşev bigihînî hev du û piştê her yekê danî cihê wan.

Got:

-Belê

Paşa:

Vê yekê pêkbîne.

Li ser fermana paşê, ferhîdê cinan, di çend xuleyan de Sitiya Zîn bi textê wê ve, ji Cizîra Botan; anî û danî oda Memê



Amadeyî Wêje

Alan ya ku li bajarê Mexribê. Piştê hingî her dû ji xew rakirin. Sitiya Zîn got:

-Tû kî yî?, Tû çiqas kesek bê pîvanî?, Tû bi çi awayî derbasî hundirê oda min bûyî?

Memê Alan got:

-Ev oda min e. Tû derbasî oda min bûyî.

Piştî curekirinekê dijwar, Memo got:

-Ger tû dibêjî oda min e; banî xadim û xizmetkarê xwe bike.

Zînê banî xadim û xizmetkarê xwe kir; lê tû kesê bersiv neda.

Piştî Memo banî xizmetkarê xwe kir, wan bersiv dan û bi vî awayî fêrbûn ku ev oda ya Memo ye.

Piştî hev naskirinê, her du dil ketin hev. Gustîlkên xwe bi hev guhartin. Şûr danîn navbera xwe û razan.

Dîsa di çend xuleyan de ferhîdê cinan, Sitiya Zîn danî odeya wê ya li Cizîra Botan. Bi beyaniyê re demê ji xew radibin, her du jî matmayî ne. Memo ji malbata xwe re dibêje: “şevê din bûyerek bi vî awayî çêbûye.” Malbat ji Memo re dibêjin: “Xewnên bi vî awayî gelek ciwan dibînin.” Li ser vê gotinê Memo hêrs dibe. Gustîlka di destê xwe de ya ku li ser sefika wê “Sitiya Zîn” nivîsandî nîşa wan dike û dibêje: “Ma ev jî xew ne?”

Li ser vê bûyerê Memo, li hespekê siwar dibe û li gor pirs û pirsyaran berê xwe dide Cizîra Botan û diçe...

DAXUYAN

Li ser karesatek, bûyerekî yan serpêhatiyek tê nivîsandin. Di nava vê serpêhatiyê de hinek tiştên awarte yên ku di nava xiyalên civakê de, wek rast tînin dîtin, ji bo xemlandinê, girêdayî cih û kesan bi bûyerê ve girêdayî, tînin bikaranîn ji van rewşên awarte yên di nava serpêhatiyê de efsane tê gotin.

Taybetmendiyan Efsanê yên giştî

1. Efsane çîrokên kevin û berhemên wêjeya gelêrî ya gel e ku ji devan derbasî devan bûye.
2. Mijarên efsanan xwe dipesêre mijarên, kes, buyer yan jî cihê û di derbarê wan de agahî dide.
3. Tiştên di efsane de tê tîgihandin, awarte jî be, taybetmendiyeke yê wê yê bawerkirinê heye.
4. Di efsanan de rewşên awarte bandorker in.
5. Ji ber ku efsane di aliyekê de civakan weke hemdem tine ziman, endamên pîroz jî hembêz dike.
6. Efsane awêneyek wê yê diyar nîne, ne girêdayî uslûbê û awaya ye; bi zimanê devokî tê tîgihandin; weke tîgihandinên gel yê kurt e, bi awayekê giştî çavkaniya xwe ji kêrhatiya dîroka derbasbûyî digre.
7. Efsane; tîgihandinên gelî yê kurt, xwerû dev bi dev belav dibe; dema bi devokî tê tîgihandin; li gor taybetmendiyan herî bêjerî bi guhartinan re rû be rû dibe.
8. Efsane; bi awayekê giştî li ser baweriyekê tîne avakirin.
9. Di efsaneyan de gelek kêrhatî tîgihandin hatî qalib kirin tînin bikaranîn. Bi vî aliyê xwe jî ji çîrokan tîne cuda kirin.



Amadeyî Wêje

LÊKOLÎN

- 1.Efsane li kuderê tîn bikaranîn?
- 2.Hûn dikarin li ser efsanê lêkolîn bikin û efsaneyekî girêdayî gelê Kurd binivîsin.

3. Destana Devokî

Destana devokî, ew destanên ku ji beriya nivîsînê, ji çandekî negelek belavbûyî derketine , bi awayekî devokî ji nîfşekê derbasî nîfşeke din bûye û piştî derbasî nivîsînê dibe.

Hinek caran dema em helbestên hozanvanan di demên cuda cuda de gotin, komî ser hev bikin û weke destan dikarin bikarbînin.

Destan çand, wêje û jiyana netewa girêdayî xwe dide diyarkirin. Her wiha bi hêzbûn yan jî bêhêzbûna ziman û wêjeya netewa xwe jî dide diyarkirin. Ev destana ku bi derketina ziman re derketî holê; ji ber di demê wêjeya devokî de derketiye, bi awayekî hûnandî derketiye hola wêjeyê. Destana ku dîroka derketina wê nayê zanîn, xwediyê hêjatiyek gelek bi nirx e. Weke destana nivîskî tê gûman kirin ku destana devokî jî li ser vê xaka pêroz derketiye û di aliyê wêjeyê de bûye berek bingehîn.

Weke her netewekê gelê Kurd jî xwediyê gelek destanên binirx e. (Rûstemê Zal, Mem û Zîn, Kawayê Hesinkar, Ferhat û Şîrîn, Dêwê Guhderz...)

1 Amadeyî Wêje

DAXUYANÎ

Taybetmendiyên Destanê

1. Mijarên ku şopek kûr li ser civakê hêlayîn; xwedî girîngiyek dîrokî, buyerên girîng yên weke karesatên xwezayî, ceng, koçberî û şewatê digre nava xwe.
2. Serpêhatî dirêj û hûnandî ne.
3. Lehengên wê yê xwedî taybetmendiyên awarte û bûyerên awarte hene.
4. Destan ji devan derbazî devan bûye û pêkhatiye, bêjerê wê yê despêkê nediyar û malê gel e û berhemê wêjeya devokî ne.
5. Dîroka di bûyera destanê de tê têgihandin nediyar e.
6. Lehengên destanê kesên bijare ne.
7. Destan dîtina hevbeş ya gelê girêdayî xwe dide pêhesandin.
8. Bi zimanek netewî û li gor pîvana hûnandina wê netewê tê gotin.
9. Mijarên wê jiyana kesên navdar, ceng, erdhej û şewat e.

Mînaka Destanê

**Ey gul.. Eger tû nazenînî
Kengê, tû ji rengê rûyê Zîn'î
Ey sinbil.. Eger heyî tû xweş bû
Rihan ji te bûyîne siyahrû
Hûn ne ji mîsalê zilfe yar in
Hûn her dû fizûl û hezekar in
Ey bilbil. Eger tû ehlê halî
Perwanyê şem'ê werdê alî,
Zîn'a me ji sorgula te geştir
Bext'ê me ji taliê te reştir'**



Dema Mem vê dibêje; Zînê dibîne û dilê wî dibore. Begê ku çûyî

nêçirê, di vegerandinê de Memo di nava Ebyayek pêçayî de dibîne. Memo dibêje begê min, tû dîzanî ez nexweş bûm. Ez teng bibûm. Dema min dixwest ez bigerim, min xwe li vê derê dît. Birayê beg Mîr Tajdîn dibin Eba de pirça Zînê dibîne. Dema Tajdîn beg, ev rewş fêhm kir, Tajdîn begî aşna dike û dibe dîwanxanê...

**'Ey şah û wezirê izz-û temkin..
 Ez hêvî dikim ne kin înadê
 Derheqê vî menbeê fesadê
 Lewra ku xwedanê ins û canan
 Wî xalîqe erd û asimanan,
 Roja ewî hubbe da hebîban
 Hingê ewî buxzê da raqîban
 Em sorgul in, ew ji bo me xare
 Em gencîn û ew ji bo me mare
 Gul hîfz-î di bin bi nûkê xaran
 Gencîne xwedan di bin bi maran
 Ger ew ne bûya di nêv me hail
 Îşqa me di bû betal û zail'.**



Ev parçeya li jor ji destana Mem û Zînê hatiye girtin

1 Amadeyî Wêje

Peyv

Nazenînî: Ciwanî

Siyahrû : Rû reş

Mîsal: mînak

Zilf: Bisk

Hezekar: Kesê heskirin ji xwe re kirî kar

Ehl: Yê girêdayî karekê

Perwan: Perwane

Werd: gul

Taliê: bext

Temkin: bi aram

Menbeê: Çavkanî

Xaliq: Xuda

Hubb: hezkirin

Hebîb: hez kirî

Buxzê: kîne r

Raqib: dijber

Xare: Strî

Hifz: Parastin

Hail: Astengî

Zail: Ya têkdiçe

LÊKOLÎN

1. Despêkê destan bi çi awayî derketine hole?
2. Li gorî we destan çiye û tê çi wateyê?

4. Çîrok



Çîrok, berhemek yê wêjeya devokî ji zimanê gel hatî girtine. Piştê ji aliyê nivîskarekê ve derbazî nivîsînê bûye.

Bûyerên di çîrokan, hemû berhemê xiyalê ne. Cih û demê wê nediyar e. Lehengê wê taybetmendiyên awarte yê jorê hişê mirovan dide diyar kirin. Di çîrokan de baş her baş in; xirab her xirab in. Yên baş tên xelat kirin û yê xirab tên seza kirin. Di çîrokan de fêrkirin bingeh e. Gelek caran mijarên gerdûnî digre nava xwe.

Çîrokên devokî yê wêjeyî yê herî kevnar, çîrokên ku cih didin, hêza li ser xwezayê re yan rastî û destanîyan bi awayekî pêkenok didin têgihandin.

Di wêjeya Kurdî de, rolekî girîng yê çîrokê heye. Ji ber gelê Kurd, weke hemû gelên Cîhanê, demekê dirêj, wêjeya xwe bi awayekî devokî domandine. Ev bûye sedem ku di gelek cîhan de, gelê Kurd hêvî û daxwazên xwe bi rengê çîrok dane hole.



Amadeyî Wêje

Mînak

Mî, Şêr û Gur

Hebû tune bû, carekê ji caran; êleke koçeran bar kir, mihek li şûna waran dimîne. Mihê jî rê girt û çû, çû rastî mêrgekê hat, di vê mêrga pir xweş de, mihê warê xwe çêkir û za; du berxên mênên.

Rojekê mihê dît ku vaye şerek bi ser de hat. Şêr jêre got:

-Tu çima li vê derê yî?

Mihê got:

-Bi saya serê te ku tu siltanê tebyan î, ez û berxikên xwe li vê derê, di vê mêrgê de diçêrin.

Şêr got:

-Qet tu hesaban neke, dil aram be, ez parêzerê te me. Şêr bi riya xwe çû, mih û berxikên xwe man di mêrgê de.

Rojekê mihê dît ku vaye gurek hat. Gurî jêre got:

-Ma tu nizanî ku ev mêrg a min e? Tu bêtî pirsê ji min bikî hatî tede diçêrî.

Mihê got:

-Ev mêrg, ya şêrî ye. Gurî got:

-Na, ev mêrg a min e û ez ê her du berxên te ji ber çêreya xwe ve bixwim.

Êrîş bire ser her du berxikan û ew xwarin, piştî vegeyriya bi ser mihê de:

-Heke careka din ez vegeyrim û te li vê derê bibînim, ez ê te jî bixwim. Gurî da rê û çû. Rojekê şêr li welatê bin destê xwe digerya, hat ser mêrgê jî. Mihê rewşa xwe û gurî jêre got. Şêr gava çîrok bihîst, got:

-Guhê xwe bide min, bêjê ez ji te re çî dibêjim. Ez ê xwe di piştî

vî kevirê he de veşêrim. Gava gur hat û gote te; ev mêrg a min e, « tu bibêje » na, ev mêrg a şêrî ye. Heke got: “na, ev mêgr a min e”, tu bibêje: “Hema sê gavan ber bi vî kevirê he de bavêje û sond bixwe û bêje bi vî kevirê ev mêrga min e; ezê bipejîrînim.”

Şêr rabû, xwe di piştê kevirê de veşart. Bêhnek di ser re derbas bû, gur hat gote mihê:

-Hêja tu li vir î? Ma min ji te re negot ji vir here?

Mihê got:

-Ev mêrga şêrî ye.

Wî got:

-Na!

Li dûmahîkê mihê got:

-Ji min re, bi vî kevirê he sond bixwe, ezê bipejîrînim.

Gur jî li tiştêkî wiha digeriya. Hema ber bi kevirê de çû û jimart:

-Ev gavek, ev du gav û ev sê gav....

Di gava sisiyan de çavên wî bi yê şêrî ketin, tirsîya, destê xwe avêt pêşîra xwe û got:

-Bavo, ez bextê xwe xira nakim, ev mêrga şêrî ye.

Dema wisa got, şêr ji ber ve rabû û ber bi wî ve hat, jêre got:

-Belê guro, ji ber ku te, ez li piştê berî dîtim, ev bû mêrga min. Lê gava te berxik xwarin, ev ne mêrga min bû.

Şêrî hema pençeyek li serê gurî da û gur di cih de kuşt.

Çîroka min li diyaran,

rehmet li dê û bavê guhdaran,

ji bilî fesadên ber dîwaran.



DAXUYANÎ

Pênaseya Çîrokê

1. Ji çîrokên gelêrî yên ku bi awayekî giştî ji afirandinên gel, ji devan derbazî devan, ji nifşan derbazî nifşan bûyî û hatî, piranî bûyer û rewşên awarte, dîsa bi lehengên awarte ve girêdayî dide têgihandin re çîrok tê gotin.
2. Hinek lehengên çîrokê teba û hinek jî heyînên li ser xwezayê re ne. Li gor bûyerên wê girêdayî çîrokan e, berhemên xiyala ne jî, beşek yê têgihandinê ye ku dîsa dikare guhdarên bide bawerkirin.
3. Çîrok; bi awayekî giştî ji aliyê kesên taybet ve, rewşên (awarte) yên girêdayî xwe, di nava dem, cih û kes de, di nava jiyana ku tê jiyana kirin de, jiyana tê xiyalkirin, bi awayekî rêkûpêk tine ziman, bi gotinên balkêş despêdike û bi gotinên balkêş bi dawî dibe. Berhemê xiyal û têgihandina devokî ye.
4. Dema ji çîroka, çîroka lehengên jiyankirî, ji jiyana rojan dîtehiş, ji tiştên mirov xiyal dikin, yê ji derveyî cîhana rastî û xwezayê tine ziman re, mirov dikare bêje berhemê pexşana devokî ye jî.

LÊKOLÎN

1. Lehengên çîroka li jor diyar bikin û têbigihîn yê xirabî kirî û yê başî kirî kî ye?
2. Li gor we cudabûna di navbera çîrok û efsanê de çi ye?

5. Helbest

Helbest, hûnerek ya endamên weke ziman, deng û ritim di nava rêkûpêkiyek diyar de bikartîne û buyer, hestiyar û hizirînekî bi taqîkirinekê gihayî û ji rêzê dûr tîne ziman.

Helbest, yek ji cûre nivîsînên wêjeyî ya herî girîng e. Bes netenê li gor çêbûna xwe, li gor naveroka xwe jî ji cûrên nivîsînên wêjeyî yên din cuda dibe. Hêvî, xiyal, evîndarî û hemû bi helbestê tene ziman. Xwendekarê ku hêza helbestê bibîne, fêr dibe ku ka çawa xiyalê xwe dewlemend bike û yê li hember xwe bandor bike.

Helbest, cûreyek yê wêjeya herî kevn e.

Helbest, bi peyvan, hûnerê avakirina awayê xweşik e.

Di helbestê de beriya her tiştî, tiştê girîng ne wateya peyvê, belkî hêjatiya tiştê gotine.

Kesên ku dibêjin, helbest bi pexşanê jî dibe; di nava şaştiyek mezin de ne. Helbest bes bi pîvan û qafiyê çêdibe.

Helbest ji pexşanê cuda, xwediyê nasnameyek pir cudatir e.

Li gor belgeyên di destê me de heyîn, herî kêr berê zayînê bi 4000 sal, di nava Cîhana me de hatiye dîtin. Li gor gelê Kurd xwediyê çanda Neolotîk e; dibe ku peydabûna helbestê ji vê dîrokê gelek kevintir helbest di nava Kurdan de hatibe gotin.

Ronî û eşkereye ku beriya zayînê helbest bi zimanê Kurdî hatine hûnandin. Helbesta Kurdî bi sere xwe, di gelek deveran de rakiriyê





Amadeyî Wêje

û gelek şûn û war dîtine. Banderê helbesta devokî ya Kurdî xwe di demê Awestayê de jî daye der. Beşa Awestayê ya bi navê “Gata yan Gatan” hemû bi awayê helbest û bi pîvana kitan hatiye nivîsandin. Ev dide diyar kirin ku beriya Awestayê jî bi heman rengî bi awayek devokî helbest hatine nivîsîn. Niha jî ew awayê helbest gotinê di nava Kurdan de heye û weke çandek kevnar di koç û dîwanxanan de tê gotin.

Taybetmendiyên zimanê helbestê ji zimanê heyî (pexşan) cuda dikin:

DAXUYANÎ

- Di zimanê helbestê de bi awayek giştî peyv, ne li gor wateya xwe ya rast tên bikaranîn.
- Di zimanê helbestê de xiyal heye lê di zimanê rojane de xiyal nîne.
- Zimanê helbestê taybetmendiyê zimanê rojane himbêz dike. Lê belê bikaranîna xiyal û gotinên hûnerî zimanê rojane derbaz dike.
- Di zimanê helbestê de bi peyvên kêr, wateyên zêde tên armanç kirin lê di zimanê rojane de ev nîne.
- Di zimanê helbestê de gotinên hûnerî bi awayekî zêde û bibander tên bikaranîn.

Mînaka Helbestê

MENDO

Mende, mende, mende
Hoy mendê min, hoy mendê min
Mende, mende, mende, lewendê min
Çûka sibê xwende, hoy mendê min
Zeriya kir govende lewendê min

Kevirê reş mezin hoy mendê min
Binde terzine lewendê min
Mendo anî jine hoy mendê min
Mendo anî jine lewendê min

Wêjeya devokî ya gelêrî



6. Mamik



Mamik; ew gotinên piranî qalib girtiyê ku agahiyên girêdayî tişt, mirov, teba, xweza, şînatî û hizirê bi awayek veşartî tine ziman, ka ew çiyê û bi hizirînê pey dakirina wê dike armanc.

Mamik, weke gelêrî û kesî dibin beş. Mamikên gelêrî berhemek yê wêjeya gel e. mamikên kesî, her çiqas berhemek wêjeyî ye, ji aliyê nivîskar yan jî helbestvanekê ve tîn afirandin. Mamika ku berhemek ya wêjeyê ye, li gor awayê xwe weke pexşan û hûnandî dibin du beş. Lê piraniya wan hûnandî ne.

Mamikên Kurdî yê ku xwe dipesêre dîrokek gelek kevnar, hebûna xwe heya roja me ya îro domandiye.

Di demê gelek kevnar de, şerê di navbera du gel, du malbat yan jî du eşîran de, dema çêdibû, gelek caran bipirskirina mamikan; serketî û binketiyê diyar bûn û şer bê xwîn bi dawî dibû. Yanî kesê bersiva mamikê dizane, weke serketî, yê nizane jî weke binketî dihat pejirandin û ev rêbaza mamikê heya niha jî dide dome. Her wiha weke pêşbikekê zanistî jî tîn pejirandin. Ev rêbaz di toreyên civakî de jî tê bikaranîn.

Weke nimûne; di toreyên civakî yê kevnar de, kesekê ji bo kesekê digotin; ger tu bersiva vê mamikê bizanî, ezê vê tiştê bidim te yan ji te re pêkbînim. Dema dizanî daxwaza wî pêk di anî.

Her çiqas bi derketina teknolojiyê re pêwîstiya bi mamikê kêmbibe jî lê di piraniyawelatê de, bi taybet di nava zarok û ciwanan de, mamik gotin tê dîtin.

Ev rêjeya mamik gotinê, di demsala zivistanê de zêdetir dibe.

Mamik gotin, hem rêbazek ya lehîstok lehîstinê ye, hem jî ya pêşxistina hîşmendiyê ye.

Di çanda gelê Kurd ya devokî de mamik gotin xwedî rolek gelek mezin e.

Mînaka Mamikê

Biharan bûk e,
Havînan sûk e;
Pehîzan pepûk e (**dara Fêkî**)

Çil çîq in,
Çil belçîq in
Çil mifte ne
Çil ode ne
Çil têde ne (**Quran**)

Mamikê mino
Ez ji serî dikim dirêj dibe
Ez ji rexê dikim pehn dibe (**cuya avê**)

Keçika heft kezî
Kaşika ve bezî
Kir hewar û gazî (**sûsik**)



LÊKOLÎN

1. Hûn jî çend mamikan peyda bikin û li lênûsa xwe binivîsin.
2. Girîngiya mamikê di wêjeya Kurdî ya devokî de lêkolîn bikin.

XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1. Di demê Medan de pirtûka Awesta bandoriye çawa li ser wêjeya nivîskî ya Kurdî û wêjeya Rojhilata Navîn kiriye?
2. Çima Awestayê di aliyê bişaftinê de bandor li derdorê nekir?

2. QONAXA WÊJEYA KURDÎ YA DEMA AWESTA



Dema gelê Kurd li hemberî Zilma Dehaq li serket, karî mafdariyê li Rojhilata Navîn serdest bike û bibe pêşengê gelên li vê herêmê. Di heman demê de Awesta Zerdeşt jî bi wêjeyekê dewlemend, bi zimanê Medî derket holê. Ev pirtûka ku bibû çavkaniya wêjeya Rojhilata Navîn û Cîhanê; di heman demê de bi zagonên ku di vê pirtûkê de heyî tevayî netewên Rojhilata Navîn, di nava hevsengiyekê de dihatin rêvebirin.



Amadeyî Wêje

Ji ber bê alîbûna Zerdeşt ev wêje li ser tu netewên din nehat ferzkirin. Ji ber vê sedemê her çiqas çavkaniya wêjeya Rojhilata Navîn jî be, lê ti kes neçarî fêrbûna zimanê wê nebûye.

Demê ku Zerdeşt dixwaze olê di nav Faris û Hindiyan de belav bike; wan neçarî fêrbûna Awestayê nake belkî di wateya Awestayê ji Farisan Zenda Awesta û ji bo Hindiyan jî Bazend nivîsand. Hêla ku dewlemendiya wêjeya Awestayê bi riya Zenda Awesta derbasî nav Farisan bibe û bi riya Bazendê jî derbasî nav Hindiyan bibe.

Her çiqas rêveberiya Împaratoriya Medan derbazî Persan bûbe; pirtûka Awesta ketibe pileya duwem de jî lê heya hatina Îskender pêşevaniya xwe ya wêjeyê domand. Pêşengê wêjeya nivîskî ya demê Awestayê Zerdeşt e.

Lê ji bilî Awestayê jî berhemên wêjeyî yên gelê Kurd yên beriya zayînê li ser çerm û keviran tên dîtin. Li gor van belgeyên di destê me de, derdikeve hole ku berî Îslamê di nava gelê Kurd de, gelek helbestvan derketine û gelek helbest ristin e. Rojhilatnasê bi navê “Fliyamînf” dibêje: “me dû helbest, ji helbestên, helbestvanê binavê Boraboz li ser kevir dîtine. Ku ew helbestkar di salên 330 berî zayînê de jiyaye.” Ew her dû helbest ev in;

“Xwazdî ez tû bi hev re bîn
Werdî bihîrîn qûtran bîn”

“Bi hîv ra hiring xurîn
Bangik dîn bi hîv ra narîn”

Wateya wê: Xweziya hingî wextê ez û tû bi hev re bûn. Em bi hev re diçûn çiyayan. Were daku em xurîniyê herîn derve; bi hev re stranekê bibêjin.herweha

Li gor dîrokzanan fabila despêkê ya bi navê “*Panca Tantra*” ya bi zimanê Sansikrîtî hatî nivîsandin berî zayînê di navbera **600-300** de li Rojhilat derketiye û Rojavayî yan jî sûd ji vê berhemê girtiye û pêşxistine.

Piştî hatina Îskender (**BZ. 330**) qirkirinek mezin li ser ziman û nivîsîna Kurdî pêkhat, di encama vê qirkirinê de **17** bergên li gel Awestayê gelek nivîsînên din hatine tinekirin û gelê Kurd ji hev hat belavkirin. Girêdanên civakî di gelek aliyan de ji hevdu hatin qûtkirin. Ev bû sedem ku zimanê Kurdî di nava xwe de parçebûnê jiyan bike û zaravayên cûr be cûr derbikevin holê. Heta hinek zanyar dibêjin Kurd ew qas belav bibûn, êdî xwe bi xwe nasnedikirin.

Di vê demê de, dibin navê Îslamê de êrişên Ereban li Kurdistanê pêktên. Ji ber vê belavbûnê hinek Kurd bi asayî xwe radest dikin lê hinek Kurd ji bo olê xwe ji dest nedin berxwedanek bêhempa dikin û bi qirkirinê re rû bi rû dimînin.

Peyv**Dehaq** :Qralê Asuriyan**Zerdeşt** :Kesê Ziman rast, Pexmberê Medan**Pers**:Pêşiyên Farisan**LÊKOLÎN**

1. Çima wêjeya Awestayê di Rojhilata Navîn nebû wêjeya deshilatdariyê?
2. Çima Zerdeşt pêwîstî dît ku ji bilî Awestayê dû pirtûkên din yê bi heman wateyê derbêxe?

XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1. Gelo hûn dizanin wêjeya Kurdî , bi pêşengiya kê derbasî nivîsînê bû?
2. Nivîsîn wê demê li ser çi dihat nivîsîn?

PÊŞENGÊ WÊJEYA NIVÎSKÎ YA DEMÊ AWESTAYÊ, ZERDEŞT

Zerdeşt (Daxza); pexmberê Kurda ye. Beriya zayînê di **sedsala 6'an** de jiyaye. Olê wî bûye olê fermî yê Med û Farisan. Nêzîkî **1000 salan** ji beriya Îslamê jiyaye. Piştvanên Zerdeşt gelek exlaq bilind, kur û giranbûha ne. Di Quranê de navê kesê girêdayî wî weke mecûsî derbas dibe. Gotina mecûsî ji peyva kosya hatiye girtin. Peyva kosya di çanda Med û Farisan de weke nasnav ji bo mirovê olî dihat bikaranîn. Ev ji beriya Zerdeşt bi vî awayî bû lê piştî hatina zerdeşt û pêkhatina mecûsiyetê bûyera her çar endamên pîrozên xwezayî “**agir, ax, av, ba**” derketibûn.

Zerdeşt navê wî yê rast **Dexza navê bavê wî Burşeb û navê dayîka wî Reyyê ye**. Ji malbata Spîtama ye. Li bajarokekê nêzîkî Êrmiyê yan li Êrmiyê bi xwe ji ji dayîk bûye. Ji Kurdên li Azerbeycanê jiyayî yê beriya zayînê Seyit Mesîh Bîblat (medya) dihat binav kirin. Ev der cihê gelê Kurdan bû û heya niha jî Kurd li wir jîyan dikin. Di roja me ya îro de, dikeve bin deshilatdariya Îranê.

Hinek zanyarên Îranî dibêjin ku Zerdeşt, ji beriya hatina Îskender ya li Îranê **258 salan** hatiye dinê. Ger em bi hesibînin,

1

Amadeyî Wêje

desteserkirina Îranê ji aliyê Îskender ve 330-333'ê ye, ev têwê wateyê ku Zerdeşt li **588-591'ê** beriya zayînê hatiye dinê û 77 salan jiyaye. Dema temenê wî dibe 30 salî penaber dibe û berê xwe dide çiyayê Eqam û li wê derê eşîrên dikevin xewlê hene û li gel wan dikeve xewlê.



Pirtûka Zerdeşt ya giranbuha Awest ye, li gor dîroknanan ji 21 beşan û **ji hezar bendî pêk** dihat. Ew jî sêsed û çil û pênc hezar û hefsed gotin bûn. Bi awayekî helbestî hatiye nivisandin.

Di ser bawerî û ramana Zerdeşt re pir demên dîrokî bûrîne. Ew ramana civakê, ya ku xudan çandeke pêşketî û jiyanek nûjen û bilnind bû, her çiqas wek maneyî **olî** tê bi navkirin jî, ji bûna diyarkirina rêgezên wî li ser elementên xwezayî bûn. Ew çar elementên xwezayî, wek: **ba, erd, roj û ay** yên bingehîn ji jiyanê re palda bûn. **Tarî û ronahî, nexweşî û xweşî, xirabî û qencî, zanîn û nezanîn** wekî têgehên nakokî dihatin dîtin. Di baweriya Zerdeşt de têgehek heye; ew ji pîrozkirina **agir** e.

Bandora olê Zerdeşt û Awestayê heya roja me ya îro jî li ser ol û civakan tê dîtin. Ger ne bizanabûn jî be, Kurdê bûyîn Musliman jî gelek erkên wî yên olî pêktînin.

Peyv

Pexmber: Qazid

Med : Pêşiyên Kurdan

Eqam : Navê çiyayekê

LÊKOLÎN

1. Zerdeşt kengî hatiye cîhanê?
2. Zerdeşt çima penaber dibe?

1 Amadeyî Wêje

Pîr Şalyar



Gora Pîr Salvar

Helbesta Pîr Şalyar

“Hoşît co kiyasto-î dana simyar bû”

Wateya vê bi kurmancî “guh û hişê xwe bide gotinên pîr şalyar”

“Ramanên xwe bihêle liba pir zanayê Pîr Şalyar”

“Dara giyan – deran cerg û dilbergin,

Gahên pir bergen, gahê bê berge,

Kerg cehêlik, hêlê cekergin,

Ruwas ce ruwas, wergen ce wergen”

Bi kurmancî:

“Dara giyandar cerg û dil pelin

Carna têr pelin carna bê pelin

Keleşêr ji hêkêye, hêk ji keleşêrêye

Rûvî ji rûviyan, gur ji guran

Ev helbest, tê gotin ku liser çermekî hatiye nivîsandin.

“ Hurmizgan rîman, etran kujan

Wêşan şerdewe gewreyî gewrekan

Zorkar Erebb kerîne xapûr

Gîna î paley heya şarezûr
Şîn û kenîkan wer rû û hiwîne
Rewşt Zerdeştî manewe bêkes”
Bi kurmancî:
Perestgehên Hurmiz xirab kirin, agirê wî vekuştin
Xwe veşartin yê herî gewre ji gewreyan
Zarokên Ereb, kirin her cihê wêran
Gihan Şarezûr gundê paleyan
Girtin hemû keç û jinan
Mêrên mêrxas man dinav xwînan
Siwarên Zerdeşt man bêkes
Hurmiz nehat rehmê li ti kes
(Ev berhem ji çavkaniya berê hatî diyarkirin hatiye girtin)

Jînameya Pîr Şalyar (1006-1098)



Pîr Şalyar yan Pîr Şehriyar ku bi Pîrê Şalyarê Hewramî navdar bû, yek ji pîr û mezinên ola **yarsaniyan** bû. Navê wî Xudadad kurê Camaspeyî ye. Ew di sala 1006-ê de li Hewramanê ji dayîk bûye. Di xortaniya xwe de çûye Loristanê, li cem Şaxoşênî yê ku rêberê ola Yarsaniyan bû û sê salan li wê derê ma. Ew li ser daxwaza Şaxoşênî vegeriyaye Hewramanê û li wê derê bîr û baweriyên Yarsaniyan belav kirin. Ew di zanista gotin û mentiqê de pispor bû û di sala **1098**-ê de mir. Hinek wî wek rêberê Zerdeştîyan yê herî dawî yê li Hewramanê bi nav dikin.

Pîr Şalyarî pirtûkek şîretan bi navê »Marîfeto Pîr Şalyar« bi Kurdiya Goranî li pey xwe hiştiye û ew li cem Hewramaniyan pir pîroz e û li wê derê hinek dibêjin ku ew ji Quranê kevnitir e, ji ber ku îslam piştî hîngî gihaye Hewramanê. Beyt, bend û şîretên Şalyarî yên di wê pirtûkê de hene, ji zardevê xelkî hatine wergirtin û nivîsandin. Tama Zerdeştîyê di helbestên Pîr Şalyarî de zal e, Kurdiya wî ji Erebi pak e û ev bi dîtina hinekan tê wê wateyê ku hêj di serdemê wî de ola Îslamê negihabû devera Hewramanê. Pîr Şalyar li cem xelkê Hewramanê wek welî û mirovekî xwedî keramet tê nas kirin û ji xwe wî gelek nexweş sax kirine û lal bi

ziman xistine. Cejna Pîr Şalyarî li Hewramanê, li cem gora wî li nîva biharê û li nîva zivistanê, her carê bi dirêjahiya sê rojan tê kirin.

Her çiqas Pîr Şalyar piştî Îslamê nêzîkî **400** salî jiyan kiribe jî lê ji hatina Îslamê bandor nebûye. Şopdarekê yê olê Zerdeşt e. helbestên xwe beriya Muslimantî here Hewremanê bi devokî gotine. Ev helbestên wî ji zardevan hatine girtin û nivîsandin. Ji ber wê, em vî wêjevanî weke wêjevanekî ji beriya Îslamê dibînin.

Peyv

Zardev: Devokî

Zal: Serdest

Hewrman: Navê herêmekê ya Rojhilatê Kurdistanê.

LÊKOLÎN

1. Jiyana Pîr Şalyar lêkolîn bikin.
2. Çima Pîr Şalyar neketiye dibin bandore olê Îslamê de?

XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1. Gelo bi hatina Olê Îslamê re wêjeya Kurdî bi çi re rû bi rû bûye?
2. Qirkirina spî ya li ziman û wêjeya Kurdî bûyî? Çi bûye sedem?

3. QONAXA WÊJEYA KURDÎ YA DEMA ÎSLAMÊ



Gelê Kurdê ku di aliyê civakî de ji hev du belav bûyî, wêjeya xwe ya nivîskî ji dest dayî, bi hatina Îslamê re ket ber pêlên bişaftinê. Her çi qas gelê Kurd xwediyê wêjeyek dewlmend û kevnar jî be, lê ji ber nemayîna nivîsina wan û belavbûna wan ya di aliyê xaknîgarî û civakî de, nekarî li hemberî wêjeyekî nivîskî û bi hêz bêtî ku bê bişaftin xwe biparêze. Ji ber ku piştî hatina Îslamê hinek Kurd bi vîna xwe Musilman bibûn û hinek jî bi zorê hatibûn musulman kirin. Ji sedsala **VII**'an û pêde ji ber musulman bûne; wêje û zimanê Ereban pîroz dihesîbînin û wêjeya xwe ji nedîtî ve tên. Ev dibe sedem

ku bi taybet di nava xwendekarên Kurd de, wêjeya Erebi zû belav bibe. Belavbûnek ewqas mezin çêdibe ku êdî her kes wisan bawer dikin ku ji bo zarokên wan yan jî ew bi xwe di agir de neşewitin, divê navê zarokên wan Erebi be. Her wiha bawer dikin ku navên ne Erebi bin, xêr di wan de nîne.

Di heman demê de Ereban dest hilat jî, ji bo li ser Kurdan deshilatdariya xwe bi riya Îslamê zêde bikin; di hemû mizgeft û medresên Kurdistanê de perwerdeya olî didin despêkirin. Bi vê perwerdê re gelek zarokên Kurdan yên ku diçûn medresan fêrî ziman û wêjeya Erebi dibûn. Heta gelek ji wan yên weke Mela Camî, Îbnû – Esîrê Cizîrî ji bo pêşxistina wêjeya Erebi xebatên mezin kirin. Lê ji ber di demek kurt de mamostayên wan medresan jî ji nava Kurdan çêbûn, di aliyê zanîstî de xwe pêşxistin û lêkolînên mezin li ser dîrok û wêjeya xwe pêkanîn. Weke Baba Tahirê Hemedanî, Elî Herîrî, Feqiyê Teyran, Melayê Cizîrî û hwd. Karîn carek din wêjeya Kurdî ya kevnar zindî bikin. Lê mixabin ji ber ku bi xwe ketibûn ber helandina Erebi; nekarîn wek tê xwestin wêjeyekê xwerû bi zimanê Kurdî derbixin holê.

Her çiqas wek tê xwestin ji bandora Erebi rizgar nebibûn jî, lê karîn Kurdan bi Kurdan bidin naskirin û her wiha karîn helbest û destanan heta ferhengan jî bi zimanê Kurdî derbixin û bidin belav kirin.

Weke tê zanîn medresên tên dabaş kirin, ji bo helandinê hatibûn avakirin lê piştî xwe naskirina hinek wêjevanên Kurd, ev medrese bû cihê xwe naskirin û welatparêziyê.

Peyv

Medres: Dibistan

LÊKOLÎN

1. Çima Kurdan navê Erebi li zarokên xwe dikirin?
2. Ma hûn dizanin çima Erebi ew qas bilez karî li Kurdistanê belav bibe? Şîrove bikin.

XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1. Gelo we metelokên Behlûl qet guhdar kirin û çawan in?
2. Girîngiya wêjeyevanekî ji bo wêjeya wê civakê çiye?

Dû malik ji helbesta Behlûl

Behlûl zatê wan zat yekdan e
Amîyan maçan Behlûl dêwan e

Kî dî dêwan e, weytewer dane bo
Merkewene meydan gerdûn rana bo

DAXUYANÎ

Wate: Behlûl tîrêja Xudê ye. Her çend ku hin kesên bê agah û nexwende wî weke dîn dizanin, kê û kî dîtiye ku dînek ew qas hêja, zana, jîr bûye û hespê xwe yê zanistê di qada hevçerxa gerdûnê de bibe zîne.

Jînameya Behlûlê Mahî (-835)



Navê wî Emerê kurê Leheb e û bi Behlûl hatiye nas kirin. Heta niha sala ji dayîkbûna wî ne diyar e lê tê gûman kirin ku ew di *sedsala heştê de li Mahîlkufê* ji dayîk bûye. Dibe ku di *sala 835'ê de, li Tengegolê miribe*. Li wê derê hatiye veşartin. Rêbaza Behlûl, rêbaza *Yarsan* rêbazek ya xudênasîn û derwîşiyê ye û hinek jî wî olî weke olekê ji ola Mîtrayîyan çiqdayî dinasin. Ew çû Bexdayê. Piştî demekî ji mana xwe ya li Bexdayê, qesta Kirmaşanê kiriye û li wê derê rêbaza Yarsiyan belav kiriye û gelek mirîd peyda kirine.

Tê gotin ku hinekan dabaşa wî bi xirabî li cem xelîfê pêncê yê Ebbasîyan Harûn el-Reşîdî (766-809) kir û xelîfeyî fermana



Amadeyî Wêje

kuştina wî da, lê îmamekê nêzîkî xelîfeyî; ji bo wî ji kuştinê rizgar bike jê xwest ku ew xwe wek dînan lê bike. Xelîfe bi wê qayil kir ku Behlûl dîn bûye û wiha Xelîfeyî fermana kuştina wî rawestand. Dibêjin piştî wê, ew di nav xelkê de wek Behlûlê dîn hat nas kirin. Wî helbestên dû beytî bi zimanê Kurdî (Kurdiya Goranî), “ku zimanê mîrgeha Erdelanê” bû, bi zimanê Erebî vehûnandine û babetên wan olî ne. Helbestên wî yên li ber destan mane, bes ew in, yên di deftera Serencamê de hatine parastin. Ew bi xwe, di van herdû malikên helbesta xwe de wiha behsa vê dînatîya xwe û rehberîya terîqeta Yariyan dike:

Dêwaney zayir, Dêwaney zayir

Danay yaran im dêwaney zayir

Zayir we ebes keften ne bayir

Recebim nesîm, loremen tayir

Bahlûl di van herdû malikên helbesta xwe de diyar dike ku ew bi dîtina hinek kesan dîn e lê ew di rastiye de zana û rêberê Yariyan e.

Peyv

Mah: Peyva despêka ya navê cihê wî ye.

Yarsan: Yarî

Babet: Mijar

LÊKOLÎN

1. Çima navê Behlûl bû, Behlûlê dîn?
2. Kîjan Sultanî, fermana kuştina Behlûl da?

Malikek ji Helbesta Baba Recebê Loristanî

Asûdem kerdên asûdem kerdên
Behlûl gewre ma asûdem kerdên
Salih ne ziriye quzlim awerden
Danawen merdum dîwaneş kerdên

DAXUYANÎ

Wate: Behlûl mezin û serokê min e. Wî ez ji hemû astengî û kopsan (teşqeleyan) asûde û vehêş kirime. Behlûl zana ye lê gel, ew şêt, dîn û dêwan e kiriye. Wî weke dîn dizanin.

Jînameya Baba Recebê Loristanî

Baba Recebê Loristanî, di sedsala **8- 9 zayînê** de jiyaye. Hûnermendek pir mezin bû. Weke alîgirê Behlûlê Mahî tê naskirin. Li gorî pirtûka Serencamê Baba Recebê Loristanî di nîvê sedsala duwem ya koçî de gav avêtiye qada jiyane. Di despêka sedsala sêyem de jî koça dawî kiriye. Hin beytên bi zaravayê Goranî ji vî wêjêvanê hêja mane û gelekî dilnîşîn, dilgir û keşînerin. Baba Recebê Loristanî di lêdana tembûrê de jî xwedî destekê berzbû û helbestên xwe bilêdana tembûrê li camêrxane û dîwanxaneyan xwendine.



Her weke hemû gel û netewên din di nav netewa Kurd de jî olperestî hebû. Berî Olê Zerdeşt di nav Kurdan de gelek ol û baweriyên olî hebûn. Berî olê Îslamê di nav Kurdan de ola Zerdeştî gelek li pêş bû. Her wiha hebûna argehan (agirdank) li Kurdistanê vî yekê ji me re ronî dîke.

Bîr û baweriya yarî ya ku bîr û baweriyeke Kurdî ye û paşmaya ola Zerdeştî, Mezdekî û olên din yê Arî ye û ji paşmaya wan pêkhatiye. Ev bîr û bawerî pêşî li Loristan û Hewramanê peyda bûye û Serokên wan di vî rêbaz û baweriyê de bi zimanê zikmakî hestên xwe yê hûndirîn tanîn ziman. Ev rêbaz pêşkêtiye, ew ziman, ew ziman bû ku Behlûl û alîgirên xwe di **sedsala 8'an** de bi wî zimanî helbest vehûnandine. Êdî her bi vî awayî ew rêbaz û bawerî li Kurdistanê belav bûye.

Baba Receb jî yek ji wan helbestvana ye kû li gor pîrê xwe tevgeriyaye.

Peyv

Loristan: Navê herêmek ya Rojhilatê Kurdistanê ye.

Berz: Hêja

Dilnişîn: di dil de rûniştî.

Keşîner: dîtî xweş

ZANISTÊN WÊJEYÎ

Nivîsînên wêjeyî bi awayek giştî dibin dû beş

a. **Pexşan**

b. **Hûnandî**

a. Pexşan:

Pexşan nivîsînek bervajiyê nivîsina hûnadî ya bi pîvan e. Ji nivîsîna hizir û ramanekê bi nivîsînek ya bi rêziman re hevhatî re pexşan tê gotin.

Her çiqas li gor hûnandiyê dereng hatibe çekirin jî lê belê bi çêbûna weşanxanê re pêşkетиye.

b. Hûnandî:

Bi taybet ji nivîsînên hest û pêhesan dide têgihandin re hûnandî tê gotin.

Hûnandî ji rêzik û malikan pêktê.

Pîvan û Kafiye ya wê peyda dibe.

LÊKOLÎN

1. Baba Recebê Loristanî şopdarê kê ye?
2. OlêYarî paşmayê kîjan ola ye?



XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1. We helbestên wêjevanên jin qet xwendine, ger we nexwendî bin helbesta wêjevana li jêr bixwînin û li wateya wê baldarbin .

Çend Malik ji helbestên Lîza Xanimê

Heyder seraf Heyder seraf
Çendî ne gêc taf

Îsa mewçan penem kiçe caf
Qebale marî ne taş mefaf

DAXUYANÎ

Wate: Ey heyderê gewher nas, demekê ez di eynêyê de bûm. Ez di nava gêjîtiya tavgeha wê avahiyê de dijiyam. Niha ji min re dibêjin ey keça Caf, dibêjin; “tû kodeya sir û razana Yarî yî ku di nava çiyayê Mesaf de yî,” bîne da tû bibî razdara rêbaza Yariyan

Lîza Xanim

Navê vê Xatûna Dildare ku weke gewhereke şev çirayî di wêjeya Kurdî de diteyîse. Lîza Xanim, ji ber ku ji malbata wê re Cafê ciwanro tê gotin, heman navmalbat li dawiya navê wêjevana me jî tê bikaranîn û dibe Lîza Xanima Caf. Lîza Xanim di **sedsala pêncama koçî de jiyaye**. Ew eslê xwe ji bajarê Şarezûrê ye. Lê belê demek dirêj li Loristanê jiyana xwe domandiye. Di pirtûka Serencamê de jî tê gotin ku Lîza Xanima Caf, yek ji alîgirên Şaxeşînê tê jimartin. Ji Lîza Xanimê hinek helbestên du malik li cih mane û gelekê xweş û balkêş in.



Lîza Xanim di lêdana tembûrê de jî şareza û hotsa bû. Wê helbestên bi awaz û bi lêdana tembûrê, li camêrxane û dîwanxanan de digot.

Peyv

Gewher: Cewher

Şarezûr: Navê navçeyek bajarê Silêmanê ye.



Amadeyî Wêje

ZANISTÊN WÊJEYÎ

Taybetmendiyên Hûnandiyê



- Hûnandî nivîsînên bipîvan û bi qafiye ne.
- Mijar û hizirên ku tî xwestin di hişê mirovan de bimîne, bi awênê hûnandî tî nivîsîn.
- Gûmanên estetîkê nakêşin.
- Aliyê wan yê bangkirin û xiyalkirinê lewaz e.
- Her çîrokek hûnandî, hûnandiyek e.

Taybetmendiyên Çîrokên Hûnandî



- Bûyerên civakê têkildar dike bikartîne.
- Hê zêdetir, mijarên wane dayîn, fêrkirin û bandorkirinê dihilbijêrin.
- Balê dikişînin li ser pîvan û li hevhatinê.
- Wate di rêzên jêr de berdewam dike.
- Cih ji axaftinên beramberî hev re tî dayîn.
- Dibe ku dirêjîya rêzikên wê ne bi qasê hev bin.

LÊKOLÎN

1. Jînameya Lîza Xanimê lêkolîn bikin.
2. Lîza Xanim di kîjan sedsalê de ji dayîk bûye?

Helbestek ji Evdilsamedê Babek

Dila şad be! Xweş dem hat bihar e
Reşemeh çû, terezin bûn diyar e

Nuwal derbûn, xişê hat av û cobar e
Befir ker ker bûbû keftî zinar e

Kulîlk û gul biken derçû ji kajan
Sivik hat nêrgîza mest kofî xar e



Jînameya Evdil Samedê Babek



Ev stêrka geşa vê mijara me, Evdilsamedê kurê Mensorê kurê Babek e. Nasnavê wî yê helbestvaniyê “Babek” e. Li gorî gotina Îbnî Xelkan, ev helbestvanê hêja di sala **362**’yê koçî, beramberî **973**’yê zayîn de, li Colemêrgê hatiye Cîhanê. Yek ji helbestvanê herî berz û navdar e. Helbest û berhemên wî bi Erebî û Kurdî ne. Helbestên wî yên bi Erebî di pirtûkên wêjeyî yên Erebî de hatine weşandin. Hin helbestên wî yên bi Kurdî ku ji bo gotinan di koç û dîwanxanan de hatîn nivîsîn ketine destê me. Helbestên wî bi piranî li ser Xuda nasî, evîndarî û xwezayê hatine nivîsandin. Li gor berhemên wî yên di destê me de helbestên wî gelek şîrîn û dilgir in. Her wiha wî sê dîwan hene. Wî di sala **410**’ê koçî de li Colemêrgê di temenê **48** saliya xwe de gelek berhem li pey xwe hêla û koça dawî kir.

Li gor belgeyên di destê me de û li gor dahûrandina me roja dayîkbûn û koça dawî ya vî wêjevanî **di sala 974-1020'î** zayînî de ye. Dema koça dawî kirî temenê wî **46** salî bû.

Evdilsamedê Babek jî weke piranî helbestvanên Kurd yê hemdema xwe hêjatiyek mezin daye zimanê Erebi û dîwan afirandine. Tiştê wî ya ji hevalên wî cuda, di wê demê de bi Zimanê Kurdî, zaravayê Kurmancî, helbest nivîsandine. Mixabin ji wan berhemên wî yê Kurmancî gelek hindik bi dest me ketine.

Peyv

Reşemeh: Sibat

Terezin: Beşek nefel

Kajan: Bişkuv

Kofî: Gulika serê nêrgizê

Mest: Serxweş

Dahûrandin: Tehlîl

ZANISTÊN WÊJEYÎ

Cudahiyên di navbera Hûnandî û Helbestê de

-Hestên di helbestê de tên şirov kirin, mirov nikare bi nivîsîna rast (helbestên serbest) bîne ziman, Di hûnandiyên de tiştên ku tê têgihandin bi nivîsînek rast dibe.

-Di helbestê de awayê bûyerê nîne, di hûnandiyê de awayê bûyerê heye.

- Di helbestê de kes, hest û bangewazî di plana yekem de, hûnandî; ,mijarên civakî yên bûyerên jiyan bûyî yan jî ne jiyan bûyî digre dest.

- Di helbestê de pir watebûn û xiyal zêdetir e, di hûnandiyê de jî peyv bi awayekî giştî di wateya xwe ya rast de tên bikaranîn.

-Hûnandî, bi awayek giştî bi rengê amojgarî û hînîkirinê ne.

Berhemên Hûnandî çi ne?

-Ji berhemên ku ji rêzik, pîvana kitan û qafiyê pêkhatî re **stran** tê gotin.

Berhemên kurt yê ku bi hûnandinê derketî holê **hûnande**, yên dirêj jî **berhemên hûnandî** tên gotin.

Peyvên stran û helbest heman wateyê pêşwaz dikin û tên bikaranîn. Helbest awênê stranê datîne holê; lê belê hemû stran ne helbest in. Helbest ew peyv in ku dikare me ji rewşa mergê heyî bigre û bike rewşa mergek din de, ya ku hestên me yên xweşik şiyar dike, ji rêzikan pêkhatî û xwedî nîrxên hûner e.

Di hûnandiyên de parçeyên herî kurt ya ku wateyek tevayî dide re mena **stranê** tê gotin.

Ji yekîneya hûnandî ya ji rêzikên, wateya hevdu temam dikan, pêkhatî re **malik** tê gotin.

Ji yekîneya hûnandî ya ji dû rêzikên, wateya hevdu temam dikan, pêkhatî re **cot** tê gotin.

Ji yekîneya hûnandî ya ji sê rêzikên, wateya hevdu temam dikan, pêkhatî re **sêtik** tê gotin.

Ji yekîneya hûnandî ya ji çar rêzikên, wateya hevdu temam dikan, pêkhatî re **çarik** tê gotin.

Ji yekîneya hûnandî ya ji pênc rêzikên, wateya hevdu temam dikan, pêkhatî re **pêncik** tê gotin.

Têbînî: Li gor hinek nivîskaran cotik, malik e lê sêtik, çarik û pêncik bend in.


Ji awayê, pîvanek ya wî ya diyar heyî, li gor qafiyeyek diyar hatî hûnandin û ji rêzikan pêkhatî re **awayê stranê** tê gotin.

Mînaka Hûnandiyê

Piste pistek

Êvar bû
Hemûyê biçûk î boyaxçî
Li quncikê Meydana Mezin
Li nav dilê bajarê Şamê
Serê westiyayî tewandibû
Wek firça nav destê xwe
Laşê xwe yê zirav bilez bilez dihejand
Hemû biçûk î aware
Di ber xwe de
Bi pistepist ev digot:

Tu bazirgan piyê xwe deyne!
 Zabit...casûs...leşker....celad
 Mirovê baş.... û mirovê pîç...
 Hûn hemû!
 Yek li pey yekî piyê xwe deynin
 Kes nema
 Tenê Xudê ma
 Ez bawer im
 Li wê dinyayê jî
 Xudê ji bo
 Boyaxkirina pêlavên xwe
 Wê gazî Kurdekî bike
 Kî dibê “ew Kurd ne ez im”
 Ax dayê!
 Tû dibê pêlavên Xudê çiqas mezin bin
 Çend numre ne lingên wî
 Lê ji bi pere!
 Dayê tu dibê Xudê wê çiqasî bide
 Tû mamoste piyê xwe deyne!



Şêrko Bêkes

LÊKOLÎN

1. Li ser rêzika duwem ya hûnandiya li jor şîroveyekî binivîsin.
2. Ji yana Evdilsamedê Babek lêkolîn bikin.
3. Ciyawaziya di navbera hûnandî û pexşanê de çîye?

Helbesta Rihan Xanim

Xweşin elest, xweşin elest
Serim ce sewday to biyen sermest
Gul û şemamem her dûha ne dest
Gewahî meden çi xas gest

Wate: Ey xweşin, roj firehî ye, ez ji ber evîndariya te şerxweş bûme. Hişê min di serê min de nemaye. Vaye gul û şemam di destê min de ne û ne her kes û ji ber çîneke çak û xirab baweriyê bi te nîne û şahadebûnê didin ku tû zar û zaroka Xudayî.

Jînameya Rihan Xanim

Ev jina helbestvan û Wêjevan ku evîndar û serxweşa evîna Yezdan bû. Hûndirê wê bi ronahiya Cîhanê ronî bûye. Ji jenga serdem û rojgarê paqij bûye. Navê vê stêrka geş li esîmanê Loristanê belav bûye. Rihan Xanima Loristanê **di sedsala pêncema koçî de li derdora Yafteko, li Loristanê ji dayîk bûye.**

Helbestên wê li ser mezinahiya Xuda, ronahî û evîna Yezdan bû. Helbestên nazik, xweş û bi pîvan bûn. Rihan Xanim, li tembûrê dida û helbestên xwe li gel dengê xwe yê xweşik li dîwanxaneyan de kederên civaka Kurd dane revandin; çand, ziman û wêjeya Gelê xwe wisan daye parastin.

LÊKOLÎN

1. Rihan Xanim kengî û li kûderê ji dayîk bûye?
2. Rihan Xanimê wêjeya gelê xwe çawa parastiye?



XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1. Gelo wêjevanî çawa ye?
2. Sûdê wêjevevanekê ji bo wêjeya wê civakê çiyê?

Helbestek ji Baba Tahirê Hemedanî

Ez ew sotî dilê bê pî û serim
 Ku dilê sotî bi eşqa dîlberim
 Dilê min daxdayê ye, ji lalerûyan
 Di demarên xwe de xwedî nişterim

Ruwê yar ger cilwe dike, di dil de
 Bi şahî ez ji tevan ronîtirim
 Di xefka zeman de, ez wa mustarib
 Weku nêçîrê wehşî birîndarim

Ku ji bilî eşqa te di dil de tiştek hebe
 Nav heftê û dû gelan de kafirim
 Di hedefa vê dunyaya fanî de
 Wek tîrek şkestî û bê perim

Her disojim, disojim, her disojim
 Bi germî ez ji agir, agirtirim
 Ezim Tahir, ku bi derd û Cefayê
 Xulamtiyê ji Muhemmed re dikim

Baba Tahirê Hemedanî

Yekemîn danerê çarika zimanê Kurdî û hozanvanekî Kurd e. Ji Rojhilatê Kurdistanê ji bajarê Hemedanê ye. Ew bi Baba Tahirê Uryan yê Hemedanî tê naskirin. Navê wî yê rast Tahir e. Ji ber ku ew ji hêjayên olê yarsan bû; digotinê Baba ku hevwatera peyva pîr e, ya ku ji bo rêberên olî dihat bikaranîn. Wî bawerî bi sofîzmê tanî û ji ber hindê jî navê Uryanî yanî rûtî li xwe kiribû. **Ew li sala 937'ê li Hemedanê ji dayîk bûye** û her li heman cihî li sala **1010'ê koça dawî kiriye**. Ji eşira



Lor'ane. Weke tê zanîn Lor di nava Kurdan eşîrek dîrokî ne. Baba Tahir hozanên xwe bi kevintirîn zaravayê Kurdî, bi zaravayê lorî nivîsandiye. Li gorî gelek jêderên dîrokî yên kevin Baba Tahir Kurê malbatek xîzan bû. Baba Tahir kesayetek jîr, şareza, aqilmend û xwedî hişk fireh bû.

Her çiqas wî bi zaravayê Lorî nivîsandibe jî lê Goranî jî dizanî; her wiha wî carnan zaravayên din jî tevî helbestên xwe dikirin û wî bi rîya helbestê, xwe bi vî awayî daye naskirin.

“Ez Ustadê zimanê Pehlewîm e
Ji kitaba evînê re mesderim
Ey Xuda eşqa Tahir bê nîşane
Ku ji îşqa seneman pê pî û serim”

Divê neyê ji bîrkin ku zimanê Pehlewî, maka Zimanê Kurdî ye û jêre Kurdîya Kevin jî tê gotin.

Baba Tahirê Hemedanî; Piraniya temenê xwe bi Tasawûfê re derbas dikir. Dev ji lezet û keyfa Cîhanê berdide. Li şûna xwarin û vexwarinê zewq ji fêrbûn û fêrkirinê distand. Piraniya helbestên wî li ser

1 Amadeyî Wêje

heskirina Xudê û Tasawûfê ne û afrênerîn e; lê di nava helbestên wî de, helbestên evîndariya rast jî tên dîtin.

Peyv

Lalerûyan: Rûyê wan weke laleyan

Nîşter: Sîxê ji bo berdana xwîna ji laşê mirove

Cilwe: Naz

Mustarib: Kesê xemkêş

Fanî: Ya tine dibe

Cefa: Xem

Rût: Tazî

ZANISTA WÊJEYÎ

Mena helbestê: Di hûnandiyê de ji beşa herî biçûk ya wateyê pêktûne re **mena helbestê** tê gotin.

Mena helbestê ji rêzikê pêktê.

Ji her sere rêzik ya helbestê re **rêzik** tê gotin.

Helbesta li jor, ji malikan pêkhatiye û her malik ji çar rêzikan pêkhatiye.

LÊKOLÎN

1. Baba Tahirê Hemedanî herî zêde helbestên xwe li ser çi dinivîsandin?
2. Wateya malika duwem ya helbesta li jor li gor tû têdigihi binivîse.
3. Çima aliyê hûnandiyê yê bangkirin û xiyalkirinê lewaz e?

Parçeyek ji helbestên Dayê Xezana Serketî

“Şêre kirya Cewer, Şêre kirya Cewer
Nedest bile, merdum, kiriya Cewer
Dadman resen, ne dest î gewr
Destî weş afat dindamiş hezewr”

DAXUYANÎ

Wate; kurê min şêro, Baba Nawus gel wêran û talan kiriye. Sîtem, zulim û zoriyê li gel dike. Were bike hewar, gel ji destê wî mirovî rizgar bike; weke şêrekî wî têk bibe daku gel ji qehr û zulma wî rizgar bibin û em jê rizgar bibîn.

Dayê Xezana Serketî

Dayê Xezana Serketî; navê vê hûnermend û wêjevana hêja Xezana keça Ehmedê Serketî ye ku li gor pirtûka Serencamê di despêka **sed sala pêncama** koçî de, li gundê Serket ji dayîk dibe. Di zarokatiya xwe de bavê xwe winda dike û dimîne sêwiyek belengaz. Dayîka wê jî ji ber feqîrî û hejariyê, ji bo ku bikare be Xezana keça xwe baş perwerde bike û ji bo pêşroja civakê biker bike, bi kesek din re pevjin dibe. Dayê Xezan, di zarokatiya xwe de, li gel dayîka xwe dest bi xwendinê dike. Piştî wê li cem mamostayê gundê xwe dixwîne û





Amadeyî Wêje

xwe baş fêrî xwendin û nivîsandinê dike. Vê care ew berê xwe dide cem hûnermend û helbestvanên Kurd. Bi vê rewşê xweşiktî û balkêşiya xwezaya Kurdistanê deriyê vehûnandinê ji wê re vedike. Li gel wê jî diçe li ser baweriya Yarî û dibe bawermenda rêbaza Yarî. Ev yek jî agirê hûndirê wê gurtir dike. Ew dest bi nivîsîn û vehûnandina ristên helbestan dike.

Dayê Xezana Serketî yek ji jinên parêzgar û Xuda nasa sedsala pêncema koçî ye. Wê di despêkê de, li dijî baba Nawusê Serketî serîhildaye, li dijî wî derketiye û bi wî re dikeve hevrikiyê. Lê paşê rêbaza wî dipejirîne û dibe alîgirê wî. Wê li ser vê yekê gelek helbest nivîsandine. Gel ji bo pejirandina wê rêbazê vexwendiyê û bang li gel kiriye.

Pevv

Cewer: êşkêşan

Weş: Weşandin

Afat: Karesat

Dindamiş: Bêxe têk bibe

Hezewr: Azadbûn, rizgarbûn

ZANISTÊN WÊJEYÎ

Ji bo xwe gihandina têgihiştinek baş û bibandor ji serlêdana hûnerê têgihiştinê re ***hûnerê peyvan yan jî hûnerê wêjeyî*** tê gotin. Ji şêweyê vegotina bibandor ya axaftinê re **uslub** tê gotin.

LÊKOLÎN

1. Jînameya wêjevanek jin lêkolîn bikin.
2. Cûdabûna di navbera helbest û hûnandiyê de çiyê?

PÊVAJOYA DERBASBÛN Û HATINA ÎSLAMÊ



Wêjeya Kurdî, di Rojhilata Navîn de, wêjeyekî dewlemend e. Wêjeya Kurdî di herêmê de xebatek mezin ji mirovahiyê re kiriye. Bi taybetî jî di pêvajoya serdemê Îslamê de. Her wêjevanek Kurd bûye dibistanek ya zanistê. Her berhemek yê wê demê, di roja me de jî çavkaniya herî mezin û dewlemend tê hesibandin.

Dema ku mirov dest tavêje pênûsê û li ser dîroka wêjeya Kurdî dinivîse, yekser ev pirs xwe li holê nîşan dide. Kengî wêjeya Kurdî hatiye nivîsîn? Yekemîn wêjevanê Kurd kî ye?

Her kesê ku lêkolînek yan jî nirxandinekê li ser wêjeya Kurdî dike, bê gûman neçar dibin, berê pênûsa xwe bidin mêjûya afirandin, derketin û rêveçûna vê wêjeya dewlemend. Her wiha bixwazî, nexwazî em neçarîn jiyana wêjevanên kevnar yên (klasîk) destpêkê, dem, rewş, merc û têgir (zerf), ew têde jiyane nasbikin.

Dagirkerên Kurdistan dagirkirine, gelekî talankar, sitemkar û ji têgeha mirovahiyê dûr in. Lêkolînvanên wêjeya Kurdî, bi taybetî yên kevnar, di destkeft û berhemên xwe yên wêjeyî û hûnerî de,



Amadeyî Wêje

rasta gelek zor û astengiyan hatine. Lewra dijminên Kurdan kelepor, kevneşop, nîrx û destnivîsên hêjayên netewa Kurd yan talan kirine yan dane windakirin yan jî cihê dax û mixabiniyê ye, şewitandine. Ji ber vê sedemê, hem dîroka gelê Kurd hem jî dîroka yekemîn nivîsînaa berhemên wêjeya nivîskî ya Kurdî, tevî gelek hewldanên lêkolînan, wêjevanên rojhilatnasan nediyarin.

Destpêkirin û desthilatiya Îslamê ya di herêma de, bi xwe re pêvajoyek nû daye destpêkirin. Dema ku em dabaşa bandora zimanê Erebi, ya li ser vê wêjeyê bînin ziman, bê guman nedîtina vê bandoriyê, di lêkolînê de valehiyekê dihêle. Bandora wêjeya kesbûn û zimanê Erebi ku dibin siya olê Îslamê de, Kurdistan û hinek gelên din xistine bindestê xwe û li ser wan gelan, bi taybetî jî gelê Kurd çewisandin kirine. Di dema Ebasiyan de hemû berhemên şarezayan, bi Erebi hatine nivîsandin. Zimanê Erebi bibû zimanê wêje, ol û hozanvaniyê.

Pîştî ku gelê Kurd olê Îslamê pejirand û pêve, pêvajoyek nû ji bo çand, wêje, kesayet û jiyana civakî despêdike. Ev pêvajo, bi xwe re guhertinekî baweriyê jî tîne. Kurd dikevin qonaxek nû. Dikevin nava çandek nû de. Ew bi xwe jî, ji bo belavkirin û pejirandina vê bawerî û çandê, dikevin nava hewldanên girîng. Di rastiyê de jî wêjevanên gelê Kurd, di civaka Îslamê de cihek erênî girtiye. Pîştî pejirandina Îslamê, li hemû herêman Kurdan xwe dane hîskirin. Ev, ji dîlpakiya Kurdan tê. Yekem çav pêketina Kurdan bi Îslamê re di sedsala VII'an de çêbûye.

LÊKOLÎN

1. Di pêvajoya hatin û derbasbûna Îslamê ya li Kurdistanê de gelê Kurd û ziman û wêjeya wî bi kîjan zoriyan re rû be rû bû?

Helbesta Herîrî



Çavên min xwîn jê diba
Ji ber eblqêt xumarî
Wekê ava dû carî
Bê wext û bê mecale

Gerden şûşa nebatê
Lêv şerbeta heyatê
Ji hûsna bit welatê
Bimin cahî helale

Methê di nazenînan
Wesfê di xwîn şîrînan
Wekî dewr û yasînan
Ez her dikim emale

Baxê ku sed bihar lê
Bilbilê lale zar lê
Ku di sed gulê bixal lê
Bilbilî nale nale

Ji Hindê bînin taracî
Ji mermerî bînin xeracî
Ji romê bistûnin bacî
Ji bo xemla şepale

Dêma xalên di hûr lê
Enya zilfe stûr lê
Rû nîva gûhê tûr lê
Mehbûbe, bê mîsale

Hisna te ya hebîbe
Dilê min jê xerîbe
Elî tu bikî nesîbe
Dest bidit wesale

Hisna te ya dilxale
Dilber lebsî siyahe
Bimin kaabe Ellahe
Tewaf dikim her sale

Ji Hind bînin talanî
Bikin kilê sibhanî
Ji bo çavê Şa-Siltanî
Dema bêtin ser sale

Çend bibêje Elî sadiq
Ji esrar û deqayiq
Ji wan wesfê di layiq
Ji hisna ya delale.

ELI HERÎRÎ (1009-1079)

Elî Herîrî li bajarokê Herîrê ya girêdayî bajarê Hewlêrê, li sala **1009**'ê zayînî ji dayîk bûye. Di sala **1079** ê de li bajarokê Herîrê koça dawî kiriye û li heman cihê hatiye veşartin.

Tê gotin Elî Herîrî yekemîn wêjevanê Kurd e ku piştî hatina Îslamê bi zaravayê Kurmancî nivîsiye. Hêjatiya Baba Tahirê Hemedanî, di zaravayê Lorî de çi be? Yê Elî Herîrî jî di zaravayê Kurmancî de jî ew e.



Dîwanek helbestan ya ku bi zaravayê Kurmancî ya Elî Herîrî heye. Her çi qas gelê Herîrê di roja me ya îro de, bi zaravayê Kurmanciya jêrîn bi axive jî lê tê gûman kirin ku gelê Herîrê wê demê bi Kurmancî axivîne. Ji ber wê demê Herîr gundek yê Çela Colermêrgê ye.

Gelek helbestên wî yên bi nirx di destê me de hene.

Peyv

Eblqêt: Zêde gihayî
Xumar: Navê cihekê
Mecal: Derfet
Nebat: Giya
Heyat: Jiyan
Hûsn: Delalî
Cahî: Yekser
Meth: Pesin
Nazenîn: Ter û nazik
Wesf: pesin
Emal: Hêvî
Tarac: Bazirganî
Xerac: Bac
Zilfe: Bisk
Mehbûb: Ya hatî heskirin
Mîsal: Mînak
Hebîb: Heskirî
Wesal: Gihandin
Siyah: Reş
Sibhan: Paqijî
Deqayiq: Bijartî



ZANISTÊN WÊJEYÎ

Di hûnandiyê de pîvan; ji pîvana peyvên, ji bo pêkanîna ahengê tê bikaranîn re **pîvan** tê gotin.

Cûrên pîvanan

2. Pîvana Kitê; Pîvana ku xwe dipesêre wekheviya kiteyên rêzikên helbestê. Di pîvana kiteyan de, rêzik dibe ku bibe dû yan sê parçe; ji cihê hatî veqetandin yê rêzikê re **rawestek** tê gotin. Rawestek peyvê na veqetîne.

Dû taybetmendiyên bingehîn yên pîvana kiteyê hene; “Jimara kitê û rawestek”

a-Jimara Kiteyê: Helbesta ku bi pîvana kiteyê hatî nivîsandin, jimara kiteyê rêzikên wê qasê hev in.

b-Rawestek; di helbestên bi pîvana kiteyan hatî nivîsandin de bi armanca zêdekirina ahengê, rêz di hin cihên diyar de tê veqetandin. Ji cihê van ji hevdu veqetandin re **rawestek** tê gotin.

Mînaka pîvan û rawestekê**HER KURD IM**

Bi derdor bim/ li mala xwe bim
 Li axa Erebi bim/li Îranê bim
 Kinc lêkirî bim/ rût û tazî bim
 Koşka min deh qatî bi/ wêran mal bim
 Azad û rizgar bim/ şadmam û xanedan
 Yan zincîr li mil/ li goşê zindan
 Sax bim, calhîl bim/ guh lê giran
 Yan zar û nezar/ li nexweşxanan
 Rûniştîbim/ li ser textê xunkaran
 Yan li kolanan/ bigerim bi hejaran
 Kurd im/ riya Kurd û Kurdistan
 Ser û pêyan didim/ li ser destan
 Bi Kurdî dijîm/ bi Kurdî dimirim
 Bi Kurdî didim/ bersiva qebranim
 Bi Kurdî dîsan/ zindî dibim
 Li vê dinyayê/ Kurdî hel diçim

Mamosta Hejar**LÊKOLÎN****1. Gora Herîrî li kûderê ye?**
**2. Cudahiya Elî Herîrî ji wêjevanên Kurdî yê zaravayê
Kurmançî çiyê?**

XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1. We carnan helbestên bi pîvana arûz xwendine?
2. Gelo hûn dizanin pîvana arûz ji kiteyê vekirî û girtî pêktên?

Parçeyek Helbest Ji Şêx Hadî

*Heqo tû padîşahî
Xudanê mehr û mahî*

*Rezaqê cin û însî
Xudayê alema qudsî*

*Mizgînî bibin Kurdistanê
Belav ken deftera îmanê*

DAXUYANÎ

Wate; Ey Xudayê mezin û giran! Tû Xudan û perwerdekarê roj û heyîvê yî. Rizqdayê cin û mirovanî. Xudayê alema pîrozî. Mizgîniyê bibin ji bo gelê Kurdistanê. Belav kin deftera Îmanê.

ŞÊX HADÎ (1075-1161)

Şêx Hadî Şêxekî zana, parêzger Xudanas û dilsoj bû. Şêx Hadî li sala 1075'ê li herêma Behdîna ji dayîk bûye. Navê wî yê rast Şerefdîn e. Navê bavê wî Mustafa ye. Hadî nasnavê wî ye. Di herêma Colemêrgê û bajarê Musil de destlatdarî saz kiriye. Şêx Hadî hem Rêberê Gel, hem jî wêjevan bû. Gelek helbest û qewlên Şêx Hadî hene.



Şêx Hadî li gorî El CILWE û MISHAVA REŞ tevgeriya ye. Şêx Hadî wek pêşengek yê Êzîdîyan tê pejirandin. Felsefa û nêrînên wî yên Zerdestiyê ne. MISHAVA REŞ ku bi Kurdî hatiye nivîsandin, ji bo Êzîdîyan pirtûka pîroz e. Hemû duayên wan bi Kurdî ne. MISHAVA REŞ piştî pirtûka IBN WEHŞÎYE kevintir pexşana Kurdîye.

Şêx Hadî di herêma Şengal û Şêxan de, desthitdariyek, di aliyê bawermendiya olî de çêkiriye û di nava Kurdên Yezdayî de bûye sembola yêkîti, zanabûn û hevkarîyê. Şêx Hadî li sala 1162'ê de koça dawî kiriye. Li herêma Şêxan li geliyê Laleşê hatiye veşartin.

Gora Şêx Hadî perestgeheke ji aliyê hemû Kurdên bawermendên Yezîdî ve tê serlêdan kirin.

Di vê pêvajoyê de gelek rewşenbîr û zanyar hene ku di Rojhilata Navîn de, ji aliyê hemû gelan ve tîrî naskirin û lê xwedî derdikevin û rêzdariyek mezin didin wan.

Mînak:”Behlûl, Meleyê Meşûr... h.w.d.



Peyv

Heqo: Xuda

Mehr: Heyîv

Mah: Roj

Însî: Mirov

ZANISTA WÊJEYÎ

Pîvana Arûz:

Pîvanek li ser bingehê dirêjî û kurtî, vekirîbûn û girtîbûna kiteyan çêdibe. Di pîvana arûz de, kiteyên rêzikan yên beramberî hev, wekhev in. Yanî ger kiteya despêkê ya rêzika yekem dirêj be, kiteya yekem ya rêzika duwem jî dirêj e.

Kiteyên vekirî; bi tîpa dengdêr bi dawî dibin. Kiteyên vekirî dibin dû beş:

a. Kiteya vekirî ya dengdirêj: bi tîpa dengdêra deng dirêj dawî dibe.

b. Kiteya vekirî ya deng kurt: bi tîpa dengdêra deng kurt dawî dibe.

Mînak:

Ger dê he bû ya me ser fi ra zek

Girtî V.dirêj v.k v.d v.d v.k g v.k v.d g

Sahib keremek suxe newazek

Mînak:

Fa' (-)

Fe ul (. -)

Fa' lun (- -)

Fe I lun (. . -)

Fâ I lun (- . -)

Fe û lun (. - -)

Mef û lu (- - .)

Fe I lâ tun (. . - -)

Fâ I lâ tun (- . - -)

Fâ I lâ tu (- . - .)

Me fâ I lun (. - . -)

Me fâ î lun (. - - -)

Me fâ î lu (. - - .)

Muf te I lun (- . . -)

Mus tef I lun (- - . -)

Mu te fâ I lun (. . - . -)

Mînaka Helbestê

Her mêrekî wan bi bezlê Hatem

- . - - . - - -

Her mêrekî wan bi rezmê Rostem

- . - - . - - -

Têbînî: Di pîvana arûz de; ger kite bi tîpa dengdêr dawî lê were vekirîye û xal (.) tê bikaranîn. Ger kite bi tîpa dengdar dawî lê were girtîye û xîzîk (-) tê bikaranîn. Kiteya dawî her dem girtî tê hesibandin û xîzîk tê bikaranîn. Ger kiteya vekirî bi tîpa dengdêra deng dirêj dawî lê hatibe dîsa bi xîzîkê tê nîşa kirin.

LÊKOLÎN

1. Li gorî we pîvana arûz herî zêde kîjan wêjevanê Kurd bikaraniye?
2. Şêx Hadî di kîjan alîyan de kariye civakê bandor bike?

DI SEDSALA XI Û XII DE REWŞA WÊJEYA KURDÎ

Taybetiyên Giştî

Piştî pejirandina olê Îslamê, rewşenbîrên Kurd ku bi zimanê Erebi dixwînin û bandor dibin; êdî gelek ji wan berhemên xwe bi Erebi dinivîsin. Di wê demê de zimanekî dibin bandora Erebi de derdikevin holê. Di heman demê de rewşenbîrên ku berhemên xwe bi Kurdî jî dinivîsin dimînin dibin bandora wêjeya Erebi de. Ji ber ku rewşenbîrên Kurd yê xwe nas jî dibin bandora Îslamê de bûn. Li aliyekê bandora olê Îslamê û zimanê Erebi, li aliyekê desthilatî û bihêzbûna hêzên derdor û li aliyê din jî êrişên Osmanî û Sefawîyan yê ku di encama şerên wan de li ser Kurdistanê dihatin pêkanîn; Hozanvanên Kurd di nava wan her sê hêzan de dijiyan û her yek diman dibin bandora yekî de. Neçar dibûn fêrî her sê zimanê biyanî bibin. Ev bi awayek diyar, di helbesta jêrîn de tê dîtin. Bi çar zimanan hatiye hûnandin.

Fate umrî fî hewakî

Ya hebîbî kule hal

Erebî

Ahû nalim him demim sed

Der fereqet mahû sal

Farisî

Ger benim qanim dilirsin

Çoq den almiş dir hal

Osmanî

Dîn ebdal bûm ji eşqê

Min nema eql û kemal

Kurdî

DAXUYANÎ

Weke di helbesta jorî de jî diyar bûyî, pêvajoyek di kesayet, têgeh û jiyana civakî de destpêdikir. Lê Kurdan toreya xwe ya kevin jî didomandin. Di pêvajoyek wiha de her ku diçû, ev bandor li ser Kurdan zêde dibû.

Weke mînak, wêjevanên Kurd yên beriya **1000**'ê zayînî, ji yê piştî **1000**'ê zayînî Kurdiya wan zelaltir e. Bi vî awayî bi pêşketina Îslametiye re di Kurdistanê de, her ku diçe bişaftinê zêdetir dibe. Lê Kurdên ku wêjeya xwe bi awayê devokî domandîn, yanî derbasî nava hêzên dagirker nebûyîn û di dibistanên wan de nexwendîn; zêde ji vê bişaftinê bandor nebûne. Ne bi zanabûn jî be, bi xêra xaknîgariya Kurdistanê û bi berhembûna wê ziman û wêjeya xwe parastine.

Mînak:

Keçikê dinê tolazê
Meşa te meşa qazê

LÊKOLÎN

1. Di sedsala XI, XII û XIII'an de rewşa wêjeya Kurdî çî bû?
2. Di van sedsalan wêjeya Gelê Kurd bi kîjan bişaftinan re rû bi rû maye?

XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1. We helbestên bi pîvan xwendine û helbestên bi pîvan bandoriyek çawa çêdike?

2. Mercên qafiyeyê pêktûnin we bihîstin e?

Helbesta Nêrgiz Xanim



Seqî li cem bade deda
Dersî rêgey çade deda

Mêrdan hemû le dewr paş
Pêman dikem gişt temaşa

Qewmê be min, neyî bî bawer
Neyêt bû cem yarî yawer

Her ke bo yar xoy nekuje
Xwînê le rêy yar nerije

Her ke lem dîn yeqîn neka
Be dil le cem amîn neka

Her ke negre qewlê dirûst
Bê dîn ew wek put perest

Her ke şikî bibê be dil
Bawer neka be şay adil

Her ke le cem negrê erkan
Berast negrê dînî sultan

Her ke be yar bida azar
Kirdey naçe bo naw tomar

“Nêrgiz” her ke bibê kîn e
Bêşik gumra û hem bê dîn e

DAXUYANÎ

Wate: Meyger (meyfiroş) li camexane û di nav cîvata Xudanasan de, bade û piyaleyên şarabê didin me. Wane û dera dînê me, hînî me dîkin. Hemû mêr li dora paşa kom dibûn. Li hev dicivîyan û li me guhdarî dikirin. Gelekî ku bawerî bi me tine be, nayê dîwaneya me. Ji bo yar nekuje, xwîna xwe di rîya wê de nerêje, bawerî bi rêbaza me tine be, bi dil û can nebêje amîn; dirûstkar û rastbêj nebe, wê çaxê ew wekî putperestekî bêbawer e. Her kesê ku di dilê wî de guman hebe; baweriya wî bi Xuda tine be, rêz û rêçikên gel nasneke, dînê Xuda mafdar, heq nezani be û yarê bê vehês bike û wê demê karên wî li lênûsek heq nayê nivîsîn.

Ey Nêrgiz! her kesê ku kîn di dilê wî de be, béguman ji rê derketî û bêdîn e.

Jînameya Nêrgiz Xanim

Navê vê helbestkara jin; *Nêrgiz e. Keça Mela Şukrulayê Şarezûrî ye. Di sala 713'ê koçî de li Şarezûrê ji dayîk bûye.* Wê li wê derê xwe gihandiye. Mela Şukrulah ku yek ji helbestvan û zanayê navdarê wê serdemê bû; keça xwe fêrî xwendin û zanista Îslamê dike. Ji ber ku Nêrgiz Xanim jî jêre amade bû; agaghiyên zanistî ji ber bike, di demek kurt de xwe pêştêxe û nav û dengê wê li welat belav dibe. Ew dest bi ristina helbestan dike.

Nêrgiz Xanim di temenê 13 saliyê de bi Abidê Caf re pevjin dibe. Paşê hevserê wê diçe li ser baweriya Yarî û rêbazên wê dipejirîne. Piştî wî jî hevsera wî, yanî Nêrgiz Xanim diçe li ser wê baweriyê û wê rêbazê dipejirîne. Nêrgiz Xanim; bi hevserê xwe re diçe gundê Şêxan û temenê xwe yê mayî jî li wir derbaz dike. Heta diçe



Amadeyî Wêje

berdilovaniya Xudê. Piştî ku ew dimire, wê li wir diveşêrîn û gora wê ya pîroz li wir e.

Ji Nêrgiz Xanimê hin helbestên bi zaravayê Kurmanciya jêrîn li cih mane ku di pirtûka Dewreyê Abîd de hatine tomar kirin.

Helbestên wê gelekî dilêş, şîrîn û balkêş in. Ji bilî helbestkariyê, ew di lêdana temûrê de jî pîspor bû.

ZANISTÊN WÊJEYÎ

Ji wekheviya dengên li dawîya rêzikên helbestan tên dubare kirin re **qafiye** tê gotin.

Qafiye herî kêrbar wekheviya dengên peyvên wateya wan ne wekhev lê nivîsîna wan wekhev yan jî wekheviya dengên li dawîya wan peyvên ya dikeve dawîya du rêzikan re qafiye tê gotin.

Taybetmendiya Qafiye

- a. Di her rêzîkekê de rawestînek aheng pêktîne.
- b. Qafiye di hêla ku helbest bi awayekî asayî di hiş de bimîne.
- c. Di aliyê wateyê de rêzikên ku ne balkêş bi hev ve dike.
- d. Ji bo peyda kirina hizirinê nû dibe alîkar.
- e. Xweşik gotinê bi helbestê re dide qezenç kirin.

Mercên Qaxfiyê

1. Ger peyva li dawîya rêzîka helbestan di aliyê deng de wekhev be, divê di aliyê wateyê de cûda be.
2. Qafiye bi ti awayî li pişt redîfê nayê.
3. Ji bo peyvek bibe redîf, divê li pêşîya wê qafiye hebe.

4. Ji bo ku tu qafiye û redîfê nasbikî, divê ti pêvekên sazker û kêşanê baş bizanî.

5. Dema di nava rêzên li pey hev, dengên mîna hev ji bo xweşîkbûna ahengê tên bikaranîn jêre nûbûna deng (aliterasyon) tê gotin.

LÊKOLÎN

1. Jînemayek ya wêjevanek jin lêkolîn bikin.

2. Taybetmendiyên qafiyê çine?



Amadeyî Wêje

